



Kurdiyât

Yıl/Sal/Year: 2021
Sayı/Hejmar/Issue: 4
e-ISSN 2717-8315
Rûpel/Sayfa Page: 23- 60



DANASÎN Û TEWSÎFA MECMÛ'EYÊN HELBESTAN DI KOLEKSIYONA ALEKSANDRE JABA DE

Yakup AYKAÇ

Kurte

Mecmû'e berhema edebî ya berhevkirî ye ku dikare derbarê zewqa edebî ya xwediyê xwe yan jî serdema xwe de agahiyên girîng bide. Bi heman rengî dikare di biwara dîroka edebiyata klasîk de jî agahiyên nû bide, helbestên nûpeyda yan jî şairên nû yên ku qet nehatine bihîstin di xwe de bihundurîne. Di vê çarçoveyê de, mecmû'e di biwara edebiyata klasîk û dîroka edebiyatê de xwedî cihê girîng in. Ji mecmû'eyên helbestan re di edebiyata kurdî ya klasîk de "keşkûl" jî tê gotin ku ew di serdema modern de beramberî "antoloji"yê tê. Mijara vê gotarê ew mecmû'eyên helbestan in ku li arşîva Akademîya Zanistî ya Leningradê di koleksiyona Aleksandre Jaba de cih digirin. Di vê koleksiyonê de mecmû'eyên helbestan ên ku hatine tesbîtkirin û bûne mijara vê xebatê di bin klasorên Kurd-26, Kurd-27, Kurd-28, Kurd-29, Kurd-36 û Kurd-45an de hatine tomarkirin. Li dora van klasoran armanca vê gotarê li gorî krîterên dîsîplîna destnivîsan danasîn, senifandin û analîzkirina van mecmû'eyan e. Di çarçoveya tewsîf û analîzên destxetan de metodolojiyê klasîk hatiye şopandin û li gorî wê jî nirxandinên sîstematîk ên destnivîsên mecmû'eyan hatine kirin. Di dawîya vê lêkolînê de taybetmendiyên şiklî ên mecmû'eyan hatine tesbîtkirin, naverok û tîkiliyên wan hatine diyarkirin, destpêka helbestên kurdî yek bi yek hatine transkîrbekirin û bi giştî nirxê nusxeyên mecmû'eyan hatine tesbîtkirin. Di pêvekê de jî navê hemû şair, hejmara helbestên wan û hin menzûmeyên kurdî di nav tabloyê de hatiye diyarkirin.

Peyvên Sereke: Koleksiyona Aleksandre Jaba, Mela Mehmûdê Bazîdî, destnivîsên kurdî, mecmû'eyên helbestan, keşkûl.

23

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types:
Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research
Article
Dema Hatînê/Makale Geliş Tarihi/Received:
01.10.2021
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/:
12.11.2021

Yakup, Aykaç, Dr. Arş. Gör. Mardin Artuklu
Üniversitesi, Kürt Dili ve Edebiyatı
yakupaykac@artuklu.edu.tr
Orcid: / 0000-0002-2602-484X

Atf: Aykaç, Y. (2021). "Danasîn û Tewsîfa
Mecmû'eyên Helbestan di Koleksiyona
Aleksandre Jaba de", Kurdiyât, 4, 23- 60.

Citation: Aykaç, Y. (2021). "Introduction and
Description of the Poetry Magazines in the
Aleksandre Jaba Collection", Kurdiyât, 4, 23- 60.

Aleksandre Jaba Koleksiyonundaki Şiir Mecmualarının Tanıtım ve Tavsifi

Özet

Mecmua, sahibinin edebî zevki veya kendi dönemi hakkında önemli bilgiler içerebilen, derlenmiş edebî ürünlerdir. Aynı şekilde, daha önce hiç duyulmamış yeni şiirler veya şairler de dahil olmak üzere klasik edebiyat tarihine önemli katkılar sağlayabilirler. Bu bağlamda mecmua, klasik edebiyat ve klasik edebiyat tarihi alanında önemli bir yere sahiptir. Klasik Kürt edebiyatında şiir mecmuaları “keşkûl” olarak da adlandırılır ki modern dönemde bunun karşılığı “antoloji”dir. Bu makalenin konusu, Rusya Leningrad Bilimler Akademisi’nde Aleksander Jaba’nın koleksiyonunda bulunan Kürtçe şiir mecmualarıdır. Tespit edilen ve bu çalışmaya konu olan Kürtçe şiir mecmuaları Jaba’nın özel koleksiyonunda Kürt-26, Kürt-27, Kürt-28, Kürt-29, Kürt-36 ve Kürt-45 klasörleri altında listelenmiştir. Bu makalenin amacı, bu nüshaları elyazma inceleme disiplini altında tanımlamak, sınıflandırmak ve analiz etmektir. Bu araştırmada elyazma incelemeleri disiplini bağlamında tarihi yazmaların bilgi ve sistematik değerlendirmelerinin yapıldığı klasik bir metodoloji izlenmiştir. Bu çalışmanın sonunda mecmuaların biçimsel özellikleri tespit edilmiş, içerik ve ilişkileri tanımlanmış, söz konusu mecmualarda yer alan Kürtçe şiirlerin girişleri verilmiş ve mecmuaların edebî değeri belirlenmeye çalışılmıştır. Ekte ise mecmualarda yer alan tüm şairlerin adları, şiir sayıları ve uzun Kürtçe manzumeler tablo şeklinde belirtilmiştir.

Anahtar Sözcükler: Aleksandre Jaba Koleksiyonu, Mela Mehmûdê Bazîdî, Kürtçe elyazmalar, Kürtçe şiir mecmuaları, Kürtçe keşkûller.

Introduction and Description of the Poetry Magazines in the Aleksandre Jaba Collection

Abstract

Macmû'â is a compiled literary product that can provide important information about the literary taste of its owner or its era. It can also provide new insights into the history of classical literature, including new poems or new poets that have never been heard of before. In this context, *macmû'â* has an important place in the field of classical literature and the history of classical literature. Poetry collections in classical Kurdish literature are also referred to as “*kashkûl*” instead of “anthology” in modern times. The subject of this article is the collections of poems that are in the collection of Aleksander Jaba in the archives of the Leningrad Academy of Sciences of Russia. In this collection, the *macmû'â* of poems that have been identified and have been the subject of this work are recorded under the categories of Kurd-26, Kurd-27, Kurd-28, Kurd-29, Kurd-36 and Kurd-45. The purpose of this article is to identify, classify, and analyze these manuscripts according to the criteria of the manuscript analysis. A classical methodology has been followed in the description and analysis of the manuscripts and systematic evaluations of the manuscripts have been carried out accordingly. At the end of this study, the formal features of the poems were identified, their content and relationships were defined, the beginnings of Kurdish poems were transcribed one by one, and the literary value of the copies of the poems was generally determined. In the appendix, the names of all the poets, the number of their poems and some Kurdish poems are stated in the table.

Key Words: The manuscripts collection of Aleksandre Jaba, Mullah Mahmoud Bayazidî, Kurdish manuscripts, *macmû'â* of poems, Kurdish *kashkûls*.

DESTPÊK

Kurdolojî wek çadeke zanistê ziman, edebiyat, dîrok, erdnigarî, etnografya û gelek biwarên din ên derbarê kurdan de di xwe de dihevine. Kurdolojî biwarekî berfireh e ku ji destpêka salên 1800an pê ve bûye cihê lêkolînê (Rohat, 1991: 9). Helbet di nav zanista kurdolojiyê de biwarên wek ziman û edebiyatê li gorî yên din gavekî din derketiye pêş. Em dikarin bibêjin ku zimanê kurdî û xebatên biwara kurdolojiyê di serê sedsala XIXan de bala zanyarên Ewrûpî kişandiye ser xwe. Bo nimûne cara yekem angaşteke zimannasî li ser kurdî li Almaniyayê peyda bûye. Li gorî vê angaştê zimanê kurdî ne farisî bû, zimaneke cuda bû lêbelê şaxeke cuda ya zimanên Hîndû-Îranî bû. Kurdolojî wek dîsîplînekê li ser vê tezê ava bûbû. Piştî zanyarên alman E. Rödiger (1801-1874) û A. F. Pott (1802-1887) ev angaştê li ser kurdî bi awayekî hûngilî parastine. Li gorî Leezenberg (2011: 87) ev cudahiya di biwara zimannasiyê de xîma vê angaştê danîbû ku kurd neteweyeke cuda bû, yan jî bi têngihîjîneke “modern-romantîk” miletekî cudatir bû ji cînarên xwe yên misilman û krîstîyan, mîna tirk, faris, ermen û asûran. Ev nêrîna romantîk-nasyonalîst bêtir bala lêkolînê kişande ser kurdan. Herçend jî aliyê zimannasiyê ve xebatên ewil li Almaniyayê dest pê kiribe jî wek biwareke zanistêke serbixwe li Împaratoriya Rûsyayê di bin xebatên Îranî de dest pê kiriye.

Di vê sedsalê de eleqaya rûsan li ser ziman û neteweyên Kavkazê dest pê kir ku kurd jî yek ji wan neteweyan bû. Wek tê zanîn di nîveka sedsala XIXan de hêza Împaratoriya Rûsyayê jî zêde bûbû û encama vê yekê dikarîbû li ser axa Osmanî kabê xwe bi Îngîlistan û Fransayê re bavêje. Lêbelê eleqeya rûsan bi kurdan re piştî şerê Qirimê (1853-1856) zêdetir bû. Heta wê demê dîlgirtiyên kurmanç û zaza yên li Rûsyayê hatibûn girtin ji bo keresteyên zimanê kurdî car caran bûne çavkanî jî. Berhema ku keresteyên kurdî yên ji aliyê P. Lerch (1827-1884) ve hatibû berhevkirin û çapkirin jî yek ji wan nimûneyan e (Lerch, 1857; Kurij, 2017). Helbet di serê sedsala XIXan de li Rûsyayê hin xebatên li ser zimanê kurdî çêbûn ku yek ji wan jî aîdê Xaçatur Abovyan (1809-1848) bû. Wî pêşengiya xebatên kurdolojiyê li Rûsyaya Çarîst kir, xebatên wî bi zimanê ermenî çap bûn, lê xêncî civata ermenî-zar di rewacê de nebûn (Leezenberg, 2011: 88). Xebat û zanyariyên kurdolojî yên ewil û kartêker di destpêkê de bi xebat û tevgerên dîplomatên rûsan çêbûn. Helbet ew dîplomat û balyozên rûs li herêm û bajarên kurdan peywirdar bûn. Li dor vê çarçoveyê em dikarin navên du balyozên rûs bidin ku yek ji wan li Tebrîzê konsolosê rûs N. Chanykowane bû ku wê demê gelek nusxe û berhem ji Akademiya Rûsyayê re şandibûn; yê din jî li Erziromê konsolosê rûs A. Aleksandre Jaba (1801-1894) bû ku bi eslê xwe polonî bû (Rohat, 1991: 95-98).

Jaba, di seranserê peywirdariya xwe ya li balyozxaneyê rûsî li Erziromê, bi pêşeng û melayên kurdan re têkilî danî. Divê ew têkiliyên ku Jaba bi gelek kesan re danîbû, ji wan ya herî taybet, Mela Mehmûdê Bazidî bû (Çelik, 2015: 28-43). Çunkî têkiliya ku di navbera wan de saz bûbû hem wekî dostanî bû hem jî têkiliyeke di navbera şagird û seyda de bû¹. Bi vî awayî bi pêşengiya herduyan berhevokên destnivîsên kurdî, dûre bûn bingeha koleksiyona destnivîsên kurdî ya Akademiya Împaratorî ya St. Petersburgê. Dîsa xebatên ku bi hev re nivîsibûn jî bo edebiyata kurdî bingeheke xurt çêkir. Bo nimûne gotara ku derheqê şair û nivîskarên kurd de nivîsiye, mirov dikare di tarîxa edebiyata kurdî de wek yekem gotara akademîk bipejirîne (Jaba, 1860; Bazidî, 2010). Herweha hêj gelek berhem û destnivîsên kurdî bi pêşengiya Jaba û Bazidî ve hatine berhevkirin, lê ji ber ku ne mijara vê gotarê ye, em ê behsa wan nekin. Lêbelê divê bê gotin ku di sedsala XIX û XXan Akademiya Împaratorî ya Zanistî ya St. Petersburgê wek navenda xebatên kurdolojiyê xebitiye.

1 A. Jaba ji Mela Mehmûdê Bazidî ne tenê berhemên kurdî xwestine, herweha jê dersên kurdî jî girtine ku bi xêra wî xwe fêrî kurmançî kiriye û dîsa bi alîkariya wî metnên kurmançî wergerandine ser zimanê fransî. Heye ku Mela Mehmûdê Bazidî ev berhem ji bo Jaba fêrî kurmançî bibe nivîsiye (Bazidî, 2020; Hassanpour, 2005: 161).

Piştî kurtedîroka xebatên kurdolojiyê ya li Rûsyayê û xebatên hevpar ên Jaba û Bazidî em ê hinekî behsa mijara esas a vê gotarê bikin ku ev jî mecmû'eyên helbestê yên vê koleksiyonê ne. Armanca me ew e ku di vê gotarê de li gor krîterên dîsîplîna destnivîsariyê danasîn û analîza van nusxeyên mecmû'eyên helbestan bikin. Em ê jî ji bo nasandina her şeş nusxeyên mecmû'eyên helbestan serî li vê rêbazê bidin û şablona klasîk a tewsîfa nusxeyê amade bikin. Li vir divê em diyar bikin ku M. B. Rudenkoyê hemû destnivîsên vê koleksiyonê tewsîf kirine û wek pirtûk jî çap kiriye (Руденко, 1961: 11-116). Lêbelê hem di kataloga Rudenkoyê de xalên ku di şablona tewsîfa nusxeyê de cih digirin hindik in hem jî zimanê katalogê rûsî ye. Loma em ê li vir ji nû ve tewsîfa her şeş nusxeyên mecmû'eyên helbestan bi awayekî berfirehtir û bi kurdî amade bikin. Hêviya me ew e ku ev xebat di şêweya danasîn û analîza destnivîsên mecmû'eyên kurdî de wek modelê jî rol bilîze. Di vê gotarê de di destpêkê de me hinekî behsa xebatên kurdolojiyê ya li Rûsyayê û A. Jaba, piştî jî behsa mecmû'eyan kir. Dûre jî zanyariyên bingehîn ên derbarê şeş destnivîsên mecmû'eyan dan û li ser van nusxeyan analîzek kir. Di vê analîzê de me nîrxê nusxeyan tesbît kir, têkiliyên di navbera nusxeyan derxistin. Piştî jî gotara xwe bi encam û çavkaniyê qedand, di pêvekê de jî çend wêneyên rûpelên destpêk û dawiyê yên her şeş nusxeyan parve kirin.

1. MECMÛ'E

"Mecmû'e" peyveke erebî ye ji peyva "cem'ê" (anîna ba hev û berhevkerinê) dariştîye û di qaliba mef'ûl de bûye bêjeyeke mê/muennes. Peyvên wek "mecamî", mecmâ', camî" jî ji heman binyatê dariştine. Îro di lîteraturê de bi wateya "berhevok, berhemên berhevkerî" tê bikaranîn (Develioğlu, 2001: 96). Di dawîya sedsala XIX û di serê sedsala XXan de di wateya kovar yan jî weşanên heftane/mehane/sê mehane de hatiye bikaranîn. Bi giştî mecmû'e ew e ku metnên dînî yan jî ne-dînî, pexşan an jî menzûmên ku aîde yek an jî zêdetir şair/nivîskarên in ku berhemên wan di cihê de kom dike. Bi kurtî mirov dikare mecmû'eyan weha jî pênase bike: Mecmû'e ji tevahiya metnên berhevkerî re tê gotin ku ev metn aîdî kesên cuda ne. Herweha têkilî û hevbeşiyek di navbera metnên ku hatine ba hev de heye (Uzun, 2003: 265).

Her mecmû'eyek ji bo serdema xwe wek neynikeke dîrokî ye, ji ber vê ye ku cihê mecmû'eyan ji bo edebiyat û dîroka edebiyatê gelek girîng e. Mecmû'e digel edebiyatê bi dîrok, civaknasî, tenduristî, arşîv û biwarên din re jî têkildar e. Gelek cureyên mecmû'eyan hene. Bo nimûne, mecmû'eyên ji helbestên bijarte hatine amadekirin, mecmû'eya nezîreyan (mecmuatu`n-nezâir), mecmû'eya rîsaleyan (mecmuatu`r-resâil), mecmû'eya ku heman cûre berhemên di hundirînê de gelek celebên din. Mirov dikare li gorî armanca xwe mecmû'eyan weha jî bisenifîne: Mecmû'eyên ku ji bo mensûbên terîqetekê hatine amadekirin, mecmû'eyên ku ji bo gel hatine amadekirin, mecmû'eyên ku ji bo kesên xwedan zewqê estetîk hatine amadekirin, mecmû'eyên ku li ser sîparîşê hatine amadekirin û hwd. Dîsa li gorî mijar û cureyên xwe mirov dikare wan berhevokan wek mecmû'eyên musîqayê, mecmû'eyên du'ayan, mecmû'eyên dîrokê, mecmû'eyên însayê û hwd. bisenifîne. Di edebiyatê de jî mecmû'e li gorî şeklên nezmê dikarin bîna senifandin wekî mecmû'eyên qesîdeyan (mecmû'eya qesaîd), mecmû'eyên xezelan (mecmû'eya xezeliyat), mecmû'eyên texmîs/muxemmesan û hwd. (Kurnaz û Aydemir, 2013: 51-64).

Ji ber ku ev xebata me li ser mecmû'eyên helbestan e, em hinekî li ser vê babetê rawestin. Mecmû'eyên helbestan ew in ku di xwe de gelek metnên menzûm di hewînê bîyî ku ji aliye şiklên nezmê li ber çavan bîna girtin. Berhemên bi vî rengî wek *mecmû'eyê eş'ar* an jî *mecmû'e-tu`l-eş'ar* jî tîna binavkirin. Bi giştî mecmû'eyên helbestan, helbestên gelek helbestvanan berhev

dikin û tînin ba hev. Di vir de xala herî girîng “zewq”a berhevkar (murettib) e. Di mecmû'eyan de ji bo cure û teşeyên edebî tu sînor tune, ji ber vê yekê ye ku di mecmû'eyan de gelek helbest hene ku şairên wan ne hevçaxê hev in û herweha ji hêla mezheb û meşrebê ve jî cihê ne. Dîsa ji gelek aliyan ve dibe ku helbestên mecmû'eyan ji hêla teşeyên nezmê ve, ji aliyê kurtî û dirêjahiyê ve, ji aliyê zimên ve ji hev cuda bin ku mirov dikare van xalan hê zêdetir bike. Hinek berhevkarên mecmû'eyên bixwe jî şair in, ji ber vê yekê gava ku mecmû'eyekê amade dikin ji helbestên xwe jî nimûneyên baş datînin. Gelek mecmû'e ji destê murettiban bixwe derdikevin, anku berhevkar di heman demê de muntensix e. Lêbelê hin mecmû'e jî hene ku nusxeyên mustensax in, anku li ser daxwaziyek an jî sîparîşê hatine lêzêdekirin (Köksal, 2012: 411). Di wan mecmû'eyan de jî heman tişt heye, anku li ser daxwaza Aleksander Jaba, mecmû'eya klasora Kurd 26 ne tê de, her pêncên din bi destê Mela Mehmûdê Bazidî û hin melayên din hatine nivîsîn.

Hin mecmû'eyên helbestan ji serî/pêşî an dawî/paşiyê winda ne yan jê ketine yan jî qelişîne. Gelek caran ev rewş di mecmû'eyên helbestan de tê dîtin. Ev kêmasî bê guman girîng in lê ji ber ku di her mecmû'eyê de her helbestek bi serê xwe berhemek e, lewma yê windabûyî zêde tesîr li girîngiya mecmû'eyê nake. Herçend mecmû'eyên giranbiha hebin jî bo nimûne yê ku ji hêla cild, tezhîb, mînyatur û hunerîn dîtbarî ve hatine xemilandin; gelek ji wan mecmû'eyan ne wisa ne, anku standardek di navbera wan de tune, ji hêla nivîs, hejmara rîsteyên li wereqekê, tew-sifên nusxeyan û gelek xalên bi vî rengî. Dîsa di gelek mecmû'eyan de qeyda ferax/îstînsaxê nayê dîtin. Ji ber ku mustensix di nivîsîna helbestên mecmû'eya xwe de li dor zewqa xwe tevdigere û di demeke dirêj de wan helbestan tîne ba hev. Lêbelê li gor hin taybetmendiyên wekî cureyê kaxez û cilda mecmû'eyê mirov dikare fikrek peyda bike, dîsa hin tarîx û nîşeyên wek jêrenot û haşîye li ser rûpelên mecmû'eyan hatine nivîsîn jî di diyarkirina serdema mecmû'eyê de bi kêr tên. Xêncî wan, hinek mecmû'e jî hene ku tê de destnivîsên cuda hene. Ew jî nîşan dide ku mecmû'e di ber destê çend kesan re desbas bûye, anku mustensixên wê mecmû'eyê ji yekî zêdetir in (Köksal, 2012: 412-413).

2. MECMÛ'YÊN HELBESTAN DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Li gorî qeyd û arşîvan di tarîxa edebiyata kurdî de gelek mecmû'eyên helbestan hene. Ji ber ku mecmû'eyên helbestan di xwe de gelek helbestan dihewînin, ji vî aliyê ve ji bo edebiyata kurdî ya klasîk yek ji çavkaniyên sereke ne. Carna mirov di wan mecmû'eyan de rastî şairên nû û herweha helbesteke nû tê ku ew jî ji bo edebiyata xwe dibe dewlemendiyek. Hin caran jî lêkolînerên edebiyatê di wan mecmû'eyan de bi saya perawêz û haşîyeyên biçûk derbarê nivîskaran de agahiyên girîng bi dest dixin û cihê wan di edebiyata xwe de destnîşan dikin. Helbet ev hemû rê û qayîde ji bo edebiyata kurdî ya klasîk û lêkolînerên edebiyata kurdî jî derbasdar e. Bo nimûne cara yekem bi xêra van mecmû'eyên helbestên di arşîva A. Jaba, lêkolînerên edebiyata kurdî pê hesiyên ku bi navê Esamî, Durefşanî û Xiyasî şairên kurd hene (Bnr. Doskî, 2020).

Wekî ku me li jorê jî diyar kir, di tarîxa edebiyata kurdî de em rastî gelek mecmû'eyên helbestan tên. Li gorî qene'eta me hê gelek mecmû'e jî li malan, li ber destê şexsan in û nehatine tomarkirin. Qismek ji wan mecmû'eyên helbestan bi awayekî ketine arşîvên muze û pirtûkxaneyên destxetan. Di vir de divê em hinekî li ser “Daru's-Selam el-Mextûtad” a Bexdayê bisekinin. Bi xebat, arşîvkirin û weşandina gelek berheman Muhemmed 'Elî Qeredaxî haya kurdan pê xistiye ku li wê pirtûkxaneyê gelek destxetên kurdî hene. Qeredaxî arşîva wê pirtûkxaneyê di berhema xwe ya bi navê *Bûjandinewey Mêjûy Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe* de daye nasandin û herweha behsa gelek mecmû'e û keşkülên kurdî jî kirine. Bo nimûne di berga yekem

a vê pirtûkê de Qeredaxî navên hin mecmû'e û keşkûlên kurdî weha rêz kirine ku tê de bêtir bi kurmancî, soranî û goranî helbest hene: *Keşkûla 'Ebdurrehman, Keşkûla Qadirê Sellesî, Keşkûla Gellale, Keşkûla Berzenceyê, Keşkûla Muhemmed Mesîha, Keşkûla Soranî, Keşkûla Ehmedê Biralê, Keşkûla Cizîrî, Keşkûla Muftî Zehawî, Keşkûla 'Ebdulqadir, Keşkûla Exter*². Bi vî şiklî Qeredaxî di bergên vê berhema xwe de bi dehan navê keşkûlên kurdî dane.

Herweha mecmû'eya ku rojhilatnasê alman M. Hartmann (1851-1918) li Stenbolê di sala 1896an de bi dest xistiye, gelek navdar e. Hartmann ji vê mecmû'eyê tenê qisma *Dîwana Melayê Cizîrî* li Almanyayê wekxwe/faksîmîle çap kiriye. Li gorî ragihandina Hartmann ev mecmû'e bi tevahî 542 rûpel in û dirêjahî û beraniya wê 21x14.8 cm e. Di vê mecmû'eya kurdî de hin şî'rên Ehmedê Xanî, *Dîwana Melayê Cizîrî*³, *Tibba Mela Muhemedê Ervasî, Nûbara Ehmedê Xanî, Eqîdenameya Ehmedê Xanî*, çend beyt û helbestên bi farisî û tirkî cih digirin (Hartmann, 2015: 129). Le Coq jî *Nûbar û Eqîdeya Îmanê* yên Ehmedê Xanî û *Mewlûda Melayê Bateyî* ya vê mecmû'eyê li Berlînê di sala 1903an de wek faksîmîle çap kiriye (Le Coq, 1903: 75-170).

Di vî warî de yek ji van mecmû'eyan ku herî zêde tê nasîn mecmû'eya Mûsilê ye. Ev mecmû'e li pirtûkxaneyaya Mûsilê ye ku li gorî qeyda îstînsaxa wê di sala 1767an de hatiye nivîsîn. E. Yûsif cara ewil ew keşkûl di sala 1961ê de peyda kiriye û piştî digel hinek şîrove û danasîna helbestan li Necefê di sala 1971ê de bi navê *Dîwana Kurmancî* çap kiriye. Di vê mecmû'eyê de gelek şairên kurd hene ku bi kurdiya kurmancî nivîsîne wekî Eliyê Herîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî, Melayê Cizîrî, Mela Mensûrê Girgaşî, Mîna, Macîn, Sadiq, Pertew Begê Hekkarî, Şêx Nûreddînê Birîfkanî. Ev mecmû'e di tarîxa edebiyata kurdî de gelek girîng e, lewre bi saya vê mecmû'eyê cara ewil şairên wek Macin, Sadiq û Mîna hatin zanîn û helbestên wan gihîştin ber destê kurdan (Yûsuf, 1988). Wekî van mecmû'eyên helbestan gelek mecmû'eyên kurdî derketine holê û ji aliye lêkolanan ve hatine çapkirin. Ji bo van jî dîsa em dikarin mecmû'eya *Keşkûlî Şî'rênî Kurdî* ya dîyalekta kurdiya goranî mînak bidin. Ev mecmû'e bi kurdiya goranî hatiye nivîsîn ku tê de gelek helbest hene. Şêx 'Ebdilmomenî Merdoxî (1739-1797) ew mecmû'e nivîsiye. Enwer Sultanî jî ev mecmû'e li Londonê di sala 1998an de çap kiriye. Dûre ev mecmû'e li Silêmaniyê ji weşanên Bînkey Jînê derçûye (Mardoukhi, 1998).

Di vî warî de mecmû'eyeke din jî *Keşkûla Kurmancî* ye. Ev mecmû'e li Sûriyê ji aliye Mela Murad ve hatiye parastin ku helbestên di navbera sedeyên X û XXan di nav xwe de dicivîne. Celîlê Celîl ji vê mecmû'eyê helbestên kurdî bijartine û li Wienê di sala 2004an de çap kiriye (Celîl, 2004). Herî dawî em dikarin behsa *Kolxaniya Veşartî* bikin ku ev mecmû'e jî helbestên Şêx Mustefayê Sîsî, Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî û gelek qesîdeyên ku li ser van şêxan hatine gotin, pêk tê. Mela Husnî Hezîn ev mecmû'e di sala 2007an de li Stenbolê bi tîpên erebî amade kiriye (Hezîn, 2007). Bi vî rengî em dikarin behsa gelek nimûneyên mecmû'e û keşkûlên helbestan, çî çapkirî çî jî neçapkirî, di edebiyata kurdî de bikin.

Çawa ku me li jorê behsa hinek taybetmendiyên mecmû'eyan kirin, niha jî em ê li ser girîngiya wan bisekinin û herweha tevkarîya wan a li edebiyatê û dîroka edebiyatê bi çend xalan ve diyar bikin. Di ziman û edebiyatên erebî, farisî û tirkî de jî gelek mecmû'eyên helbestan çêbûne ku li ser wan jî gelek xebat hatine kirin. Bo nimûne ji bo tewsîfa mecmû'eyên osmanî/tirkî projeyek bi navê "MESTAP" (Projeya Tewsîfa Sîstematîk a Mecmû'eyan) hatiye amadekirin û hin pêşniyaz li

2 Qeredaxî arşîva pirtûkxaneyaya Bexdayê di berhema ya bi navê *Bûjandinewey Mêjûy Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe* [Vejandina Dîroka Zanayên Kurd bi rêya Destxetan re] de weşandiye. Ev berhem xebatek e biblîyografîk e ku ji neh bergan pêk tê. Herweha wek çavkaniyeye sereke ji bo tarîxa edebiyata kurdî ya klasîk gelek girîng e (Qeredaxî, 1998).

3 Hartmann ji vê keşkûlê tenê *Dîwana Melayê Cizîrî* bi pêşgotineke kurt, bi zimanî almanî wek faksîmîle li Berlînê çap kiriye (Bnr. Hartmann, 1904: I-XI).

wir hatine rêzkirin. Me jî di diyarkirina van krîteran de ji vê projeyê sûd wergirt (Bnr. Köksal, 2012: 430-433; Tarlan, 1946: 122-123). Li gorî encamên wan xebatan, em jî dikarin çend hêmanên bingehîn ên li gorî taybetmendiyên mecmû'eyên kurdî weha rêz bikin:

a) Bi xêra mecmû'eyan dibe ku mirov rastî helbestên şairên jibîrbûyî bê ku navên wan di çavkaniyên dîroka edebiyatê de nehatine behskirin. Bo nimûne navên şairên wek Xewsî, Durfeşanî û Esamî bi mecmû'eyên koleksiyana A. Jaba hatin zanîn.

b) Hinek şair hene ku di çavkaniyan de tên zanîn, herweha dîwanên wan jî hene lê bi saya mecmû'eyan dibe ku hin helbestên nû yên wan şairan bên peydakirin.

c) Hinek helbest bi guhertoyeke din di mecmû'eyan de cih digirin, carna beytên zêde yan kêma hene, yan jî cudahiyan nuxseyan di navbera helbestan de çêdibin.

d) Di hin mecmû'eyan de haşiyê û nîşeyên perawêzan hene ku derbarê şair de carna agahiyên girîng didin, wekî tarîxa wefata şair.

e) Di mecmû'eyan de bi piranî gelek helbestên şairên cuda cih digirin, lê hin mecmû'e hene ku bêtir bala xwe didin helbestên şairekî. Lewma nirxandina mecmû'eyên bi vî rengî li dor tarîx û herêma wê, dibe ku ji hêla sosyolojiya edebiyatê ve agahiyên girîng bide edebiyatnasan û lêkolêrên wê biwarê.

f) Mecmû'e ew berhemên edebî ne ku gelek caran mustensîxên wan jî şair in. Lewma helbestên di mecmû'eyekê de herçiqas li dor zewqên mustensîx hatibe civandin jî nêrîneke derbarê wê sedsalê jî dide. Ji ber ku zêdebûna hejmara helbestên şairekî, yan jî zêdebûna teşeyê nezmê, qalibên arûzê, serwa û gelek tiştên din dê nîşanî lêkolêran dide ku ew şair wê serdemê gelek populer bû yan jî fikrek dide ku di nivîsandina helbestên klasîk de wê serdemê kîjan cure û teşeyên edebî dihatin tercîhkirin.

Her yek ji van xalên ku me li jorê diyarkirin, dibe ku bi tena serê qîmetek dernexe meydanê. Bo nimûne tenê li gorî analîzkirina mecmû'eyekê heke em bibêjin helbestên Ehmedê Xanî zêde ne, dibe ku ev yek, tenê zewqa mustensîx nîşanî me bide. Lêbelê gava hemû mecmû'eyên helbestan yên herêmekê yan jî serdemekê bi awayekî giştî bê nirxandin hingê mirov dikare hin esas û nêrînên xurtir îddîa bike. Çawa ku nirxandina giştî ya vê gotarê de em ê bibînin ku di hemû mecmû'eyên helbestên koleksiyona A. Jaba de hejmara helbestên Ehmedê Xanî zêde ye, ev jî nîşanî me dide ku li herêma mîrektiya Bazidê berhemên Xanî gelek deng dabûn û dihatin xwendin. Bi vî şiklî hê gelek xalên din dikarin bên zêdekirin. Lêbelê piştî van agahî û nasandinên teorîk, em ê pratîka wan li mecmû'eyên helbestan ên koleksiyona Jaba de bisepînin, herweha danasîn û analîza van nusxeyên mecmû'eyên helbestan li gorî krîterên dîsîplîna destnivîsariyê bikin.

3. DANASÎN Û TEWSÎFA NUSXEYÊN MECMÛ'EYÊN HELBESTAN

Di koleksiyona A. Jaba de şeş nusxeyên mecmû'eyên helbestan hene ku li arşîvê di bin klasorên Kurd 26, Kurd 27, Kurd 28, Kurd 29, Kurd 36 û Kurd 45an de hatine tomarkirin. Di zanista destnivîsariyê de nasandina nusxeyên destnivîs bi rêbazeke taybet tê kirin ku mirov dikare jê re bibêje tewsîfa nusxeyê. Di senifandin û tewsîfa nusxeyê de şabloneke klasîk heye ku divê nusxeya destnivîs, li gorî wê şablonê bê nasandin. Xalên ku di vê şablonê de cih digirin, ji aliyê derekî yê nusxeyê ber bi aliyê navekî ve tên rêzkirin (Adak, 2017: 5; Subaşı, 2020: 28). Di vê gotarê de em ê jî ji bo nasandina her şeş nusxeyên mecmû'eyên helbestan serî li vê rêbazê bidin û şablona klasîk a tewsîfa nusxeyê amade bikin, li vir jî nû ve tewsîfa van mecmû'eyên helbestan bi awayekî berfi-

rehtir û bi kurdî amade bikin. Lêbelê ji ber ku nusxeyên orjînal li Rûsyayê di Pirtûkxaneyê Giştî ya St. Petersburg (Lenîngrad)ê de ne û li Zanîngeha Mardin Artukluyê tenê nusxeyên wan ên dijîtal hene. Ji ber vê yekê di agahiyên wekî dirêjayî û berayiya kaxezê de me serî li pirtûka Rudenkoyê da. Ji bilî van zanyariyên Rudenkoyê, hemû xalên din ên tewsîfa nusxeyan li gorî kopyaya nusxeyan hatine amadekirin.

3.1. Tewsîfa Mecmû'eya Kurd 26

Di nav kolleksiyona Jaba de mecmû'eya helbestan a herî kevn ev e. Li rûpelekê qeyda nivîs yan jî helbestekê tune ye. Lê mirov dikare ji kevnbûn û rengê kaxezê, şikl û şemala mecmû'eyê texmînekê bike ku ew jî herî kêr 300 salî ye. Dîsa bi ihtîmaleke mezin ev mecmû'e ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî ve hatiye peyda kirin. Di vê mecmû'eyê de zanyariyên rûpela pêşîn, hejmara sitûnan û qeyda temetê tune ye.

Di vê mecmû'eyê de ji bilî helbestên kurdî bi zimanên erebî, farisî û tirkîya osmanî jî helbest hene. Di nav helbestvanan de navên Eliyê Herîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Muradxanê Bazîdî, Feqiyê Teyran, Xiyasî, Mela Meqsûdê Durefşanî, Esamî û Xewsî cih digirin. Navê helbestvanên din jî Nabî, 'Abid, Mewlana û Dîwanî ye. Di vê mecmû'eyê de digel menzûmeyên *Zenbîlfiroş*, *Kela Dimdimê* û *Qewlê Hespê Reş* zêdetir helbestên evîndarî û irfanî cih digirin.

Di nav helbestên mecmû'eyan de herî zêde helbestên Ehmedê Xanî hatine nivîsîn. Digel ên Xanî, helbestên Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî di sêrî de tên. Dîsa gelek qesîdeyên dirêj an menzûme jî di wan mecmû'eyan de hatine nivîsîn. Menzûmeya *Zenbîlfiroş* di nav hemû mecmû'eyên helbestan de cih digire, anku şeş caran hatiye nivîsîn. Wek tê zanîn di edebiyata kurdî de, menzûmeya *Zenbîlfiroş* jî aliyê Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û Muradxanê Bazîdî ve hatiye nivîsîn (Teyran, 2014; Teyran, 2012). Lê di nav wan mecmû'eyan de navê Muradxanê Bazîdî derbas nabe, ew yan li ser Feqiyê Teyran yan jî li ser Melayê Bateyî hatiye qeydkirin. Dîsa li gor wan nusxeyan jî aliyê helbestê ve jî du cureyên vê helbestê çêbûne. Yek ji wan bi vê beytê,

Ey dil werîn dîsa bi coş carek ji cama mey firoş

Bikin qîsseta *Zenbîlfiroş* da seh bikin hikayetê

dest pê dike ku mecmû'eyên Kurd 26, Kurd 27 û Kurd 36 weha ye. Ya din jî bi vê beytê,

Ey dil werîn ey hûn werîn dîsane bi coş camek ji cama neyê

Bi noş bikem qîsseta *Zenbîlfiroş* da seh bikine hikayetê

dest pê dike ku mecmû'eyên Kurd 28, Kurd 29 û Kurd 45 jî bi vî şiklî ne. Ji aliyê naverokê ve herdu cure wekî hev in. Menzûmeya din a di vê mecmû'eyê de *Qewlê Hespê Reş* a Eliyê Herîrî ye ku herweha bi navê Borê Qer jî navdar e (Bnr. Yıldız, 2021). Ev menzûme dîsa di mecmû'eya Kurd 36an de jî bi heman formê hatiye nivîsîn û li ser navê Eliyê Herîrî hatiye qeydkirin. Digel vê menzûmeyê helbesteke din a Eliyê Herîrî jî di vê mecmû'eyê de heye. Piştî van agahyan li gorî krîterên tewsîfa nusxeyan eger em li ser mecmû'eya di Kurd-26an de bisekinin, dê tabloyeke weha derkeve pêşya me:

Navê Berhemê	: Mecmû'eyê Xezeliyatê Kurmancî
Taybetiyên Bergê	: Bergekî şîn e û karton e. Hemû kaxezên hundirê bergê ji aliyê piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûtin.
Taybetiyên Kaxezê	: Kaxezên vê mecmû'eyê zerê tarî ye, kaxez gelek kevin e, gelek

	cihên vê nayêne xwendin.
Hejmara Wereqan	: Bi tevahî 27 wereq in.
Hejmara Rêzan	: Rêz û sitûn tunene, ji ber vê nayê jimartin, risteyên her wereqê ji hev cuda ne.
Ebadên Destxetê	: 26x9 cm.
Rengê Murekkebê	: Bi giştî reş e, lê ji ber ku ev mecmû'ê gelek kevin e di gelek ciyan de rengê murekkebê hinekê gewr dixuyê.
Pêşiya Nusxeyê	: Mecme'a Xezeliyatêd Xiyasî Fermayed Dila wer da bibêjim dil ji min bir dilberê Hêstirêd xwîne dirêjim dil ji min bir dilberê (wr. 1a)
Paşiya Nusxeyê	: Ferd Çeraxê 'eşq umîdîm efendim Çeraxî ettî benî (wr. 27b)
Sernav	: Di serê her helbestê de nebe jî, navê helbestvan an jî naveroka helbestê wek sernav hatiye danîn. Ev sernav jî diyar dike ka ev helbest ya kê ye. Herweha sernav bi zimanê farisî hatine nivîsîn. Bo nimûne di serê çend helbestan de sernavên weha hene: Ehmedê Xanî Fermayed, Qewlê Hespê Reş, Bate Fermayed, Qewlê Zenbîlfiroş, Dîwanî Fermayed.
Derkenar	: Di wereq 5a de îbareyeke weha derbas dibe, "Sahibuhu ve malikuhu Feqî Camî" anku "Xwedêyê nusxeyê Feqî Camî ye".
Taybetiyên Din	: Di nav mecmû'eyan de ji reng û taybetmendiyên kaxezê diyar dibe ku keşkûla herî kevn û herweha ji aliyê naverokê ve jî ya herî berfireh ev mecmû'ê ye. Di gelek sahifeyan de hem aliyê rast û çepê hem jî di navbera wan de helbest, ruba'î, gotinên xweş hatine nivîsîn. Wekî din, di vê nusxeyê de wereqên vala nîne. Di rûpelan de carna nivîsên ku di demên cuda de hatine nivîsîn hene ku ew jî ji rengê murekkebê, ji cudatiya destnivîsê diyar dibin.
Di vê mecmû'eyê de yek bi yek nav û rêza helbestan weha ye:	
Helbest No, 01	: Ev helbest li ser navê Xiyasî [غیائی] hatiye qeykirin û bi kurdî ye. Xiyasî Fermayed Dila wer da bibêjim dil ji min bir dilberê Hêstirêd xwîne dirêjim dil ji min bir dilberê (wr. 1a-1b)
Helbest No, 02	: Ev helbest bê sernav e ⁴ , weha dest pê dike; Ya reb qedde zîba ye ev yan Ke'beya 'ulya ye ev Yan Mescîdu'l-Eqsa ye ev yan Sidre yan mermer e ev (wr. 2a)
Helbest No, 03	: Ev helbest di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 2b) de jî heye. Xanî Fermayed

4 Ev mecmû'ê kifş e ku ji hev derketiye û piştî cardin bi hev ve hatiye zeliqandin. Lewma cihê hin rûpel û wereqan guherine. Dibe ku ev wereq jî wisa hatibe guhertin. Çunkî tê zanin ku ev beyt û yê li pey vê, dewama helbesta Ehmedê Xanî ye ku weha dest pê dike:

*Îro li textê dilberê ya Reb çî şîrîm esmer e
Jê nabitin min dil berê ew dilber e yan dilber e (Bnr. Xanî, 2014: 193).*

- Helbest No, 4**
 Îro li textê dilberê ya Reb çî şîrîn esmer e
 Jê nabitin min dilberê ew dilber e ya dilber e (wr. 2b)
 : Ev helbest di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 3b) de jî heye.
 Xanî Fermayed
 Ey dil ger te divêtin bibî daîm mesrûr
Helbest No, 5
 Di terbxaneê dunya vexwe ava engûr (wr. 3b)
 : Ev helbest di arşîva Kurd 36an (wr. 4b) de jî heye.
 Xanî Fermayed
 Ey dil eger bi neqdê can cinsê giranbuhayê zulf
Helbest No, 6
 Dê bikirî bizan mecan cewher û canfedayê zulf (wr. 4a)
 : Ev helbest di arşîva Kurd 36an (wr. 5b) de jî heye.
 Xanî Fermayed
 Me dî neqşek ji neqşê neqşibendan
Helbest No, 7
 Vebû bendê di min yek yek ji bendan (wr. 4b)
 : Ev helbest di arşîva Kurd 36an (wr. 4a) de jî heye.
 Xanî Fermayed
 Ey dil qelb (qet) nahejê yek ser mûjganê zulf
Helbest No, 8
 Kî nehejê tu pêlekî şubhetê min li bayê zulf (wr. 4b)
 : Dawiya Zenbîlfiroş ev e. Di vê destxetê de tevlihevî heye,
 serî hatiye binî û binî jî hatiye serî. Heta 5b-6a-6b-7a-7b'an de
 dewam dike. Ev jî nîşan dide ku wereqên mecmû'eyê di hin ci-
 yan de qetiyane û şaş hatine rêzkirin. Dîsa ev menzûmeya Zen-
 bîlfiroş e, heman versiyona vê di Kurd 36an (wr. 21a) de jî der-
 bas dibe. Weha dest pê dike û diqede:
 Ey Mîm û Hê xweş defter e herçî ji min ne bawer e
 Ne ji ummeta pêxember e ne musteheqqê şefa'etê (wr. 5a)
 ...
 Ey dil werîn dîsa bi coş carek ji cama mey firos
Helbest No, 9
 Bikin qiseta Zenbîlfiroş da seh bikin hikayetê (wr. 7b)
 : Ev helbest a Nabî ye û bi zimanê tirkî ye (wr. 8a-8b).
Helbest No, 10
 : Ev helbest a Xewsî⁵ ye û bi zimanê tirkî ye (wr. 8b).
Helbest No, 11
 : Ev helbest a Melayê Bateyî ye ku di mecmû'eya Kurd 36an (wr.
 27b)an de jî heye û weha dest pê dike:
 Batê Fermayed
 Derd û dax im derman le'lê yaran hû
 Sîne germ im efxanê pêt û narin hû
 Dê çî lê kim ez milk û mal û zêr
 Ji gerdena zer ez hêvîdar im hû (wr. 9a)
Helbest No, 12
 : Ev helbest a Melayê Bateyî ye ku di mecmû'eya Kurd 36an (wr.
 27b)an de jî heye û weha dest pê dike:
 Batê Fermayed
 'Aşiqê zulfa reş im, 'aşiqê şeyda ye zulf
 Bê bade lew serxweş im, serxweşê şeyda ye zulf

5 Navê şair Xewsî herçend di wan mecmû 'eyan de derbas bibe jî heta ku dîwana wî peyda nebû, nedihat zanîn ku şairekî kurd e. Xewsî di sedsala XVIIIan de di mîrektiya Bazîdê de wek katibê serayê şol kiriye. Agahiyeke kurt derbarê wî û dîwana wî de di kovara Nûbiharê de der çûye (Ulugana, 2016: 6-9).

- Helbest No, 13** Serxweş im ez vê demê, keftime tora xemê
Kuştime vê perçemê, çiçek û re'na ye zulf (wr. 9a)
: Ev helbest a Mela Meqsûd e. Di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 28b) de jî li ser navê "Esamî" hatiye qeydkirin. Ji vir em tê derdixin ku navê Esamî, Mela Meqsûd e. Ev yeka ji bo dîroka edebiyata kurdî ya klasîk gelek girîng e.
Mela Meqsûdê Esamî Fermayed
Çira hûn rayekî nakin li min way
Min îro xan û man wêran e îro (wr. 9b)
- Helbest No, 14** : Ev helbest bi zimanê farisî ye û weha dest pê dike:
Goftê 'Abîd
Ey xuncaê perwerdeê gulzarê letafet
Ey sir û riyazê çemenê baxê terawet (wr. 10a)
- Helbest No, 15** : Ev helbest a Eswed e û bi zimanê tirkî ye (wr. 10a-10b).
- Helbest No, 16** : Ev helbest a Şemsê Tebrîzî ye û bi zimanê farisî ye, sernavê wê weha ye: Goftê Şemsî Tebrîzî (wr. 10b).
- Helbest No, 17** : Ev helbest a Dîwanî ye û bi zimanê tirkî ye (wr. 11a).
- Helbest No, 18** : Ev helbest a Ehmedê Xanî ye, zimanê helbestê bi tirkî ye û weha dest pê dike;
Ey gulin perwerde-i gulzar-i teravet
Vey serv-i qedîn sebze-yî bostan-i teravet
Vechin banadur minber û mihrab-i ibadet
Zulfin gamî serhelqe-i zûnnar-î hidayet
Însane degildir bu tasavvur bu şerafet
Peh peh bu ne şekl û ne şemail ne qiyafet (wr. 11b)
- Helbest No, 19** : Ev menzûmeya *Qewlê Hespê Reş* a Elî Herîrî ye û di wereqên 12a, 12b, 13a, 13b'an de cih digire. Heman menzûme di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 24b) de bi sernavê "Qewlê Hespê Reş Hikayetê Elî Herîrî Nam" derbas dibe. Weha dest pê dike û diqede:
Mecal ew mecal bû
Kafirek dîn-betal bû
Hespek çê li bal bû

Hespê di nêv kuffaran e
Bi dil musulman e
Muhammed pê 'ellame
...
Xaç ji xûnmê çêkiriwî
'Ewrekî reş î tarî, baranek jê dibarî
Sond nik ve li 'Umer û 'Elî
Ji şehîd bit deşta Bedr û Huneynî
Temmet
- Helbest No, 20** : Di wereqa 14a de ruba'îyeke farisî heye û di wereqa 14b de jî îbareyên erebî û gotinên Hz. Elî hene.
- Helbest No, 21** : Menzûmeya *Kela Dimdimê* ya Feqiyê Teyran e. Di wereqên

- 15a, 15b, 16a, 16b, 17a, 17b'yê de hatiye nivîsîn û di dawiya helbestê de "Temmet" jî hatiye gotin.
Em dimrin nayêne rayê
Axret xweştir e ji dinyayê
Helal kiriye Tahayê,
Mezhebê ve bi kêr nayê
...
Ji Mim û Hê û Xan ra
Fatîhe ji rûhê wan ra
Temmet
- Helbest No, 22** : Ev helbest di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 29b) de jî heye.
Elî Herîrî Fermayed
Xelqo werin bibînin çi husnek e bi kemal e
Heyran ji dil bibînin ji sun'ê zu'l-celal e (wr. 18a-18b)
- Helbest No, 23** : Ev helbest di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 28a) de jî heye.
Durfeşanî Fermayed
Dîsan dixwîne dilberek, min dî ji nûra rehetmetê
Îro keman leb şekkerek, da min piyalek şerbetê (wr. 18b)
- Helbest No, 24** : Ev helbest a Şemsê Tebrîzî ye û bi zimanê farisî ye, sernavê wê weha ye: Gofteê Şemsî Tebrîzî (wr. 23a-23b).
- Helbest No, 25** : Ev helbest a Melayê Bateyî ye ku weha dest pê dike:
Batê Fermayed
Xeberdar im xeberdar
'Aşîqek im daxdar (wr. 23b-24a)
- Helbest No, 26-27-28:** Di vê wereqê de rûba'iyêke farisî, helbesteke Durrî (Gofteê Durrî) û helbesteke Nabî heye ku ew herdu jî bi zimanê tirkî ne (wr. 24a).
- Helbest No, 29** : Ev helbest a Ehmedê Xanî ye. Mersiyeya wî ya li ser mîrê Bazîdê ye. Ev mersiye di heman demê de di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 7b) de wek medhiye hatiye qeydkirin ku bi sernavê "*Medhinana Ehmedê Xanî Derheqê Hakîmê Bazîdê Muhammed Beg*" derbas dibe. Weha dest pê dike:
Kanê Muhammed Beg kanê, kan padişahê Serhedan
Îro ji dil bigrîn de lo, kan padişahê Serhedan (wr. 24b-25b)
- Helbest No, 30** : Ev helbest a Ehmedê Xanî ye û di mecmû'eya Kurd 36an (wr. 5a) jî derbas dibe, weha dest pê dike:
Xanî Fermayed
Durdane ji dev da me dibarin dem û satan
Kes nîne bibit wan bigerîne di welatan (wr. 25b-26a)
- Helbest No, 31-32:** Di vir de helbesta Xosro û Şêx Se'dî heye ku her du jî bi farisî ne (wr. 26b - 27a).
- Helbest No, 33** : Ev helbest a Şemsê Tebrîzî ye û bi zimanê farisî ye (wr. 27a).
Wekî ku me yek bi yek helbestên vê mecmû'eyê diyar kirin, di vê mecmû'eya Kurd 26an de digel helbestên kurdî bi zimanên din jî hem helbest hem jî gotinên wecîz hene. Di vê mecmû'eyê de piştî kurdî, bi zimanê farisî û tirkîya osmanî jî helbest hatine qeydkirin. Eger em vê mecmû'eyê

aîdê de vera mîrektiya Bazîdê qebûl bikin, li gor vê mecmû'eyê mirov dikare bibêje ku di sedsala XVIIIan de li mîrektiya Bazîd û derûdora wê, di nav kesên xwende de helbestên bi zimanê farisî û tirkî jî dihatin xwendin. Herweha ji hêla teşeyên nezmê ve bêtir xezel, qesîde, menzûme, ruba'î, mufred cih girtine ku dîsa li gor van cureyên teşeyên nezmê mirov dikare bibêje ku di vê serdemê de di nav civaka kurdan de ev cure berbelav bûn û dihatin tercîhkirin. Di nav helbestên kurdî yê ve mecmû'eyê de şî'rên Ehmedê Xanî ji aliyê jimarê ve bêtir in, lewma em dikarin bibêjin ku li mîrektiya Bazîdê di vê serdemê de Ehmedê Xanî şairekî navdar bû.

3.2. Tewsîfa Mecmû'eya Kurd 27

Ev destxet wek mecmû'eyekê hatiye amadekirin ku tê de du helbestên Ehmedê Xanî, helbesteke Melayê Bateyî û çar menzûmeyên Feqiyê Teyran hene. Digel wan helbestan menzûmeyaya *Qewlê Newala Sîseban* û *Zenbîlfiroşa* Feqiyê Teyran jî di vê mecmû'eyê de hatine nivîsîn. *Qewlê Newala Sîseban* di mecmû'eyên Kurd 27, Kurd 28, Kurd 29 û Kurd 45an de heye. Di nav van nusxeyan de destpêka Kurd 28, 29 û 45an wekî hev in û bi zimanê erebî dest pê dikin, lê ya Kurd 27an piştî sernavê metn bi kurdiya kurmancî dest pê dike û weha jî didome⁶. Metna Kurd 28 bi erebî dest pê dike, piştî rûpelekê derbasî kurdî dibe ku ew jî wek metna Kurd 27an e. Di dawiya *Qewlê Newala Sîsebanê* ya Kurd 27an de di helbestê de navê Ehmedê Hekarî derbas dibe:

Îslam dûr bû vî carî kafir dimane mehzûn

Ew Ehmedê Hekarî gotî kilamê mewzûn (wr. 16a)

Lêbelê heta niha em dizanin ku gelek guhertoyên metna *Qewlê Newala Sîsebanê* hene, ji ber vê yekê em nizanin ka gelo nivîskarê vê metnê bi rastî jî kî ye. Lewre ev metn di nav medreseyên kurdan de gelek belav bûye û gelek caran ji aliyê kê ve hatibe îstînsaxkirin, dibe ku muntensîx hingê navê xwe jî di nav helbestê de lê zêde kiribe. Jixwe gelek nimûneyên bi vî awayî jî hene. Bo nimûne, di pirtûka *Qewlê Newala Sîsebanê* ya A. Demîr de wek çavkanî sê nusxeyên cuda hene ku yek ji wan li ser navê Xalidê Zibarî ye û yek ji wan jî Mela Bekir e (Demir, 2012). Di vê mecmû'eyê de zanyariyên rûpela pêşîn, hejmara sitûnan û qeyda temetê tune. Li gorî krîterên tewsîfa nusxeyan zanyariyên mecmû'eya di Kurd 27an de weha ne:

Navê Berhemê	: Li berga pêşîn hatiye nivîsîn.
Bi Kurdî	: Mecmû'ê [مجمعا]
Taybetiyên Bergê	: Bergekî şî'n e û karton e. Hemû kaxezên hundirê bergê ji aliye piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûtin.
Taybetiyên Kaxezê	: Kaxezên vê mecmû'eyê zer e û di her rûpelê de 10 rêz hene.
Hejmara Wereqan	: Bi tevahî 38 wereq in.
Hejmara Rêzan	: Nêzîkî 740 rêz in.
Ebadên Destxetê	: 26x9 cm.
Dîroka Îstînsaxkirinê	: Di wereqa 17an de dawiya helbestê tenê sala wê, h. 1272 (m. 1855-56) hatiye nivîsîn.
Rengê Murekkebê	: Tenê bi murekkeba reş hatiye nivîsîn.
Pêşiya Nusxeyê	: Mecmû'ê

Haza beytu Sîseban bi Cenwizyan ceng kirîm
Guh bidne hikayetê şerê Cenwizan qissetê
Gelî yar û ehaban ji seyyîdê sadatan
Wan çendî ehaban di riya dîn kirin xebatê (Berga Pêşiyê)

⁶ Di pirtûka *Keşkûla Kurmancî* ya Celîlê Celîl de jî *Qewlê Newala Sîsebanê* heye û li ser Ehmedê Hekarî, bi *Beyta Sîsebanê* hatiye qeydkirin. Ev metna Celîlê Celîl û Kurd 27 wek hev in, ji heman arşîvê hatiye girtin. (Bnr. Celîl, 2004).

- Paşîya Nusxeyê:** Canan ji te ey Xanî canan bixazîtin
Ha nuqte li bin danî fîl hal di mizgîn da (wr. 38b)
- Sernav:** Di serê her helbestê de bi murekkeba reş sernavek hatiye danîn.
Wek mînak: Haza Beytun Sîseban, Zenbîlfiroş, Goftê Xanî û hwd.
- Derkenar:** Di wereqa 23an de bi zimanê erebî weha nivîsiye: *“Nemmeqehu heqîru feqîr ila muhtaci te’ala feqî feyzullah ah mine’l-mewt”*
- Taybetiyên Din:** Ji bo ku helbest tevlihev nebin li dawîya her helbestê xetek hatiye kişandin. di vê nusxeyê de tenê rûpela dawiyê vala ye, wekî din wereqeke vala tune ye.
Di vê mecmû'eya helbestan de yek bi yek nav û rêza helbestan weha ne:
- Helbest No, 1:** Destpêk û dawîya Qewlê Sîsebanê weha ye;
Guh bidne hikayetê, şerê Cenwizan qîssetê
Gelî yar û ehaban ji seyyîdê sadatan
Wan çendî ehaban di riya dîn kirin xebatê
Zehmet nayête hisaban nakeve ji kêf ewqate
Cenawîz ehlê 'ezaban (berga ewil)
....
Ya Reb bidî necatê wechê Hebîb bibinin
Vêk ra biçine cenatê heta ebed bimînim
Ji ber meken ewqatê destê xehûn hilînin
Her gav û her sa'etê fatihan ji wan ra bixûnin (wr. 17b)
- Helbest No, 2:** Di vê mecmû'eyê de helbesta duyem Zenbîlfiroşa Feqiyê Teyran e. Ji ber ku me di Kurd 26an de derbarê Zenbîlfiroşê de agahî dabû, li vir em ê tenê destpêk û dawîya wê bidin:
Ey dil werin dîsa bi coş
Carek ji cama mey binoş
Bikin qîsseta Zenbîlfiroş
Da seh biken hikayetê (wr. 17a)
...
Mîm Hê xweş rehber e
Kesî ji min ne bawer e
Ne ji ummeta pêxember e
Ne laîqê şefa'etê (wr. 22b)
- Helbest No, 3:** Di vê mecmû'eyê de helbesta sêyem ya Ehmedê Xanî ye. Heman helbest di arşîva Kurd 36an (wr. 15a) de jî derbas dibe ku weha ye:
Goft Xanî
Ey derîxa, mame تنها ez ji şemsa xawerê
Xan û man têk bûne zulmet paşî wê dêm enwerê (wr. 22b)
- Helbest No, 4:** Helbesta çaran “Ey Av û Av”a Feqiyê Teyran e. Ev helbest di arşîva Kurd 45an (wr. 1a) de jî heye.

- Goft Feqiyê Teyran
Ey av û av ey av û av
Ma tu bê 'îşq û muhbetî
Mewc û pêlan davê bilav
Bê sekn û bê rahatî (wr. 23a)
...
Mîm û Hê bi qelb û mitalan
Yan bi van her fikr û xilalan
Ras dike bend û misalan
Şa'irê nesihetê (wr. 26a)
- Helbest No, 5:** Helbesta pêncan a Feqiyê Teyran e lê bê sernav e. Weha dest pê dike û diqede;
Hûn werin lêzim werin
Cîran û xelqê hêşetê
Hûn rayekê çar nakerin
Îro qewî girya min tê (wr. 26a)
...
Mîm û Hê şa'irê pak e
Her kesê bi rûh ji mak e
Hemîyan Xaliq fena ke
Xeyrî ji Şahê Qudretê (wr. 29b)
- Helbest No, 6:** Ev helbest a Mela Huseynê Bateyî ye.
- Goft Batê
Ya Reb tu kerîm we rehîm î
We Xudayê melikê mulkê cihan î
Melikê mulk û kerîm î
Melikê 'erş û 'ezîm î (wr. 29a)
...
Tu xeffar î ez zenûn im
Êz ê tavî me ketime
Tu wî dermanê dewayê
Hey hey hey hey hey hey hey hey (wr. 31b)
- Helbest No, 7:** Helbesta heftan a Feqiyê Teyran e.
- Goft Feqî
Ji rengê dilbera horî
Gelo ya Reb dibin peyda
Zerîfa şeng niha borî
Şefeq da hew di rojê da (wr. 31a)
...
Ez diçim yoldaş diminin
Mîm û Hê di bîra xwe bînin
Fatihan jê ra bixûnin
Ew xezel bêne diyare (wr. 33a)
- Helbest No, 8:** Helbesta heştan a Feqiyê Teyran e.
- Goft Feqî

Îllahî 'ebduke etak
 Fehaza 'induke etak
 We ma Rebbu lehu suwak
 Tu birehimtir î ji dad û bab (wr. 33a)
 ...
 Mîm û Hê pir gunehkar e
 Qewî pir muflis û jar e
 Belê navê te Xeffar e
 Bi 'eta û fezl û ihsan î (wr. 36a)
Helbest No, 9: Helbesta nehan a Ehmedê Xanî ye ku ev helbest di arşîva Kurd
 36 (wr. 10b)an de jî heye.
 Goft Xanî
 Neqqaşê ezel roja serlewheê rengîn da
 Pergar di destan bû sersefhe ku tezyîn da (wr. 36a)
 ...
 Canan ji te ey Xanî canan bixazîtin
 Ha nuqte li bin danî filhal di mizgîn da (wr. 38a)

3.3. Tewsîfa Mecmû'eya Kurd 28

Di vê mecmû'eya helbestan de tenê du menzûme hene ku yek ji wan *Qewlê Newala Sîseban* û ya din jî *Zenbîlfiroş* e. Ev mecmû'e li gor mecmû'eyên din hinekî din ji aliyê naveroka xwe ve taybet e, lewma em dikarin ji bo mecmû'eya Kurd 28ê "Mecmû'eya menzûmeyan" bibêjin.

Menzûmeya *Qewlê Newala Sîseban* a vê mecmû'eyê ji aliyê destpêkê ve hinekî ji ya Kurd 27an cudatir e. Di vê menzûmeyê de destpêk nêzî rûpelekî bi erebî ye, dûre ziman diguhere û dibe kurdî. Herweha di nav metnê de jî gelek cudahî hene lê naverok, bûyer wekî hev in. Menzûmeya duyem a vê mecmû'eyê *Zenbîlfiroşa* Melayê Bateyî ye. Di arşîva Kurd 26 û Kurd 27an de jî *Zenbîlfiroş* hebûn lê herdu jî yên Feqiyê Teyran bûn. Mijara herduyan jî ji aliyê naverokê ve yek e lêbelê di vegotin û terza helbestê de cudahiyek heye. Li gorî krîterên tewsîfa nusxeyan zanyariyên mecmû'eya di Kurd 28an de weha ne:

Navê Berhemê:	Li rûpela pêşîn
Bi Kurdî	: Newala Sîsebanê û Zenbîlfiroşî [نوالی سیسه‌بانی و زنبیل فروشی]
Bi Frensî	: <i>Nevala Sisebani et Zenbil-Ferouch</i>
Zanyariyên Rûpela Pêşîn	: <i>Nevala Sisebani, Le défilé de Siseban ou La valeé de Sisebani et Zenbil-Ferouch</i>
Taybetiyên Bergê	: Berg karton e û rengê wê jî şîn e. Hemû kaxezên hundirê bergê ji aliye piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûtin.
Taybetiyên Kaxezê	: Kaxezên vê mecmû'eyê zerê tarî ye.
Hejmara Wereqan	: Bi tevahî 16 wereq in.
Hejmara Sitûnan	: Her rûpel ji du sitûnan pêk tê.
Hejmara Rêzan	: Bi giştî 450 rêz in.
Ebadên Destxetê	: 24x17 cm.
Qeyda Temetê	: <i>Temmet biyedey Molla Mustefa / Sene sîttun we seb'une we mîeteynî we elf</i> (wr. 15a).
Dîroka Îstinsaxkirinê	: h. 1276 (m. 1859)

- Rengê Murekkebê** : Di vê mecmû'eyê de ji bo sernavan murekkeba sor, ji bo nivîsan murekkeba reş hatiye bikaranîn.
- Pêşiya Nusxeyê** :
Haza Beytu Sîseban bi Cenwayiz ra ceng kerd
We bihi neste'înu ya Ellah ya Mu'în
Subhanellahi`l-ehed kullî şeyîn qedîr
Qedîmu`r-rebbîs samed
Hem exîr û lem yelîd we lemyuled
La 'izze lew la te'xîrî la misluka qettu ehed (wr. 2b)
- Paşiya Nusxeyê** :
Mexrec dûr e ji roja axretê
Ya Muhammed herçî ji meznaya we da
Nizan ne ji ummeta pêxember
Ew bi heq ji şefa'etê temmet
Temmet biyedey Molla Mustefa
Sene sîttun we seb'une we mîteynî we elf (wr. 15a)
- Sernav** : Di menzûmeya Sîsebanê de li du ciyan, di menzûmeya Zenbîl-firoş de jî li serê metnê tenê carekî sernav hatiye danîn. Herdu sernavên destpêkê bi zimanê erebî hatine nivîsîn, lê ya ku di navberê de ye bi kurdî ye.
Herweha di serê Zenbîlfiroşê de li wereqa 11a'yê bi zimanê fransîzî weha nivîsiye: *Zenbil-ferouch (vendeur de panier par Mella Baté)*.
- Taybetiyên Din** : Di wereq 11a'yê de wekî bergeke nû tenê navê helbestê bi zimanê fransîzî hatiye nivîsîn ku weha ye: *Zenbil-ferouch (vendeur de panier) par Mela Baté*.
Di dawiya Qewlê Newala Sîsebanê de navê Ehmedê Efendiyê Xanî derbas dibe. Anku li gorî vê mecmû'eyê nivîskarê vê menzûmeya dirêj Ehmedê Xanî ye ku navê wî weha derbas dibe:
Dîne heq sabit kirina
Ew man li wê mehzûn ew Ehmed
Efendî Xaniyê gotin kelam
Haniyê hêvî dikin ji yarê (wr. 11b)
Her du helbestên vê mecmû'eyê weha dest pê dikin:
- Helbest No, 1:**
We bihi neste'înu ya Ellah ya Mu'în
Subhanellahi`l-ehed kullî şeyîn qedîr
Qedîmu`r-rebbîs samed
Hem exîr û lem yelîd we lemyuled
La 'izze lew la te'xîrî la misluka qettu ehed (wr. 2b)
...
Gelî xelqê civatê sellu 'ela Muhemmed
Li ser pira selewatê, li ber nûra Muhemmed (wr. 11b)

Helbest No, 2:

Haza Qewlê Zenbîlfiroşê 'Aşiqê Zelfîl
 Ey dil werîn ey hûn werîn dîsane
 Bi coş camek ji cama neyê
 Bi noş bikem qisseta Zenbîl-
 firoş da seh bikine hikayetê
 Zenbîlfiroş law ku pak bû
 Bi kuflet û ehl û 'eyal bû (wr. 12b)
 ...
 Mexrec dûr e ji roja axretê
 Ya Muhammed herçî ji meznaya we da
 Nizan ne ji ummeta pêxember
 Ew bi heq ji şefa'etê temmet
 Temmet biyeday Molla Mustefa
 Sene sîttun we seb'une we mîteynî we elf (wr. 15a)

3.4. Tewsîfa Mecmû'eya Kurd 29

Di vê mecmû'eyê de du helbest hene. Yek ji wan *Qewlê Newala Sîsebanê ye*, ya duyem jî *Zenbîlfiroş* e. Ev mecmû'ê jî, wekî mecmû'eya Kurd 28ê, "Mecmû'eya menzûmeyan" e. Ji aliyê nave-rokê ve ger em li vê mecmû'eyê binêrin, em ê bibînin ku Qewlê Newala Sîseban di mecmû'eyên Kurd 27, Kurd 28 û Kurd 45an de hene. Ji ber ku me di Kurd 27an de behsa vê helbestê kiribû, em cardin xwe dubare nakin. Di vê helbestê de (wr. 40b.) jî navê Ehmed Efendiyê Xanî derbas dibe.

Menzûmeya Zenbîlfiroş di nav hemû mecmû'eyên helbestan de jî cih digire, anku bi tevahî şeş çaran hatiye nivîsîn. Wek tê zanîn menzûmeya Zenbîlfiroş ji aliyê Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî û Muradxanê Bazidî ve hatiye nivîsîn. Lê di nav wan mecmû'eyan de navê Muradxanê Bazidî derbas nabe, yan li ser Feqî yan jî li ser Bateyî hatine qeydkirin. Ji ber ku me di Kurd 26an de behsa vê helbestê kiribû, em cardin behs nakin. Li gorî krîterên tewsîfa nusxeyan zanyariyên mecmû'eya di Kurd 29an de weha ne:

Navê Berhemê	: Li rûpela pêşîn.
Bi Frensî	: <i>Nevala Sisebani la valeé de Siseban par Faki Teiran et Zenbil-fe-rouch par Ahmed Khani Melai Bate</i> ⁷ .
Zanyariyên Rûpela Pêşîn	: <i>Copie Chah-Nazar, sur manuscrit appartenant à Mela Moustapha, qui pafsa plus Kurd en Mifsefaian de M. Jaba poutant la date de 1276., laquelle copie a été faite par le Kiatib Chah-Nazar.</i>
Taybetiyên Bergê	: Bergekî şîn e û karton e. Hemû kaxezên hundirê bergê ji aliye piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûtin.
Taybetiyên Kaxezê	: Kaxezên vê mecmû'eyê zer e.
Hejmara Wereqan	: Bi tevahî 57 wereq in.
Hejmara Sitûnan	: Her rûpel ji du sitûnan pêk tê.
Hejmara Rêzan	: Di her rûpelê de 7 rêz hene.
Ebadên Destxetê	: 24x17 cm.

7 Di berga ewil de Zenbîlfiroş berê ser navê Ehmedê Xanî hatiye nivîsîn, dûre navê Melayê Bateyî hatiye lê zêdekirin û paşê jî li ser navê Ehmedê Xanî xêzek hatiye kişandin. Li ser vê xeletiyê em dikarin wê pirsê ji xwe bipirsîn, ka gelo di nîveka sedsala XIXan de destana Zenbîlfiroş li ser navê Ehmedê Xanî dihat zanîn yan ew şaşnivîs û sererastkirin tenê xeletiyêke basî a îstînsaxê ye?

Qeyda Temetê	: <i>Temmet bi yedey Mella Mustefa / Senete sît we seb'ûn we mîeteyn we elf</i> (wr. 56b).
Dîroka Îstînsaxkirinê	: h. 1276 (m. 1860)
Pêşîya Nusxeyê	: Haza Beyti Sîseban bi Cenwiz ra Ceng Kerd We bihi neste'înu ya Ellah ya Mu'în Subhanellahi el-ehedi kulle şeyîn qedîr Qedîmun er-Rebbu`s-semedû Hem axîr lem yelîd we lem yuled (wr. 2b)
Paşîya Nusxeyê	: Bi zat ev ne ji ummeta pêxember Ew bi hêvî ye ji şefa'etê temmet e Temmet bi yedey Mella Mustefa Senete sît we seb'ûn we mîeteyn we elf (wr. 56b)
Sernav	: Di vê mecmû'eyê de li du cihan de sernav hatiye nivîsandin. Yek berga ewil e, ya duyem jî di wereq 41b'yê de hatiye nivîsîn ku ew jî bi fransîzî-latînî ye û weha ye: <i>Poème de Zenbil-ferouch (vendeur de parier)</i> . Ji bilî wan, di serê herdu helbestan de sernav hatiye danîn, me ew di naverokê de destnîşan kirine.
Taybetiyên Din	: Di wereqan de milê rastê ji bo helbestên kurdî hatiye veqetandin, herweha milê çepê jî ji bo fransîzî hatiye veqetandin lê vala maye, nivîs an jî not tune. Destpêk û dawîya herdu menzûmeyên vê mecmû'eyê weha ne:
Helbest no, 1:	Haza Beytun Sîseban bi Cenwiz ra Ceng Kerd We bihi neste'înu ya Ellah ya Mu'în Subhanellahi el-ehedi kulle şeyîn qedîr Qedîmun er-Rebbu`s-semedû Hem axîr lem yelîd we lem yuled ... Dînê Heq sabit kirin, Usan li wî mehzûn ew Ehmed Efendiyê Xanî gotin kelam, Hanî hêvî dikim ji yarê (wr. 40) ... 'Eresat wechê cîbê pênc, Jiber mekin hûn ewî weqtê herdem Her sa'eta nûn temmet Ewane di bîra xwe werînin (wr. 41b.)
Helbest no, 2:	Haza Qewlê Zenbîlfiroş 'Aşîqê Zelîl Ey dil werîn ey hûn werîn dîsane Bi coşî camek ji cama ney Binoş bikem qiseta Zenbîl- firoş da seh bikin hikayetê (wr. 41b)

...
Bi zat ev ne ji ummeta pêxember
Ew bi hêvî ye ji şefa'etê temmet e

*

Temmet bi yedey Mella Mustefa
Senete sît we seb'ûn we mîteyn we elf (wr. 56b)

3.5. Tewsîfa Mecmû'eya Kurd 36

Mela Mehmûdê Bazidî ev mecmû'e bi destnivîsa xwe nivîsiye. Wisa diyar e ku wî mecmû'eya Kurd 26an cardin bi nivîseke xweşik derbasî deftereke nû kiriye. Lêbelê di mecmû'eya Kurd 26an de helbestên bi zimanê din jî hebûn. Dibe ku Mela Mehmûdê Bazidî li ser daxwaza A. Jaba ev mecmû'e amade kiriye û lewma jî tenê helbestên kurmancî derbasî vê mecmû'eyê kirine. Di vê keşkûlê de helbestên 9 şairan hatine berhevkerin ku tê de 37 helbest hene. Di nav van helbestan de 34 hebê wan wek xezel û qesîde; 3 heb ji wan jî wek menzûmeyên dirêj hatine nivîsîn ku ev menzûme *Qewlê Hespê Reş*, *Zenbîlfiroş* û *Şerê Kela Dimdimê* ne. Ji wan helbestan 25 helbest li ser Ehmedê Xanî hatine qeydkirin ku 2 heb ji wan wek hev in. 2 helbest ên Feqiyê Teyran in ku yek ji wan (Bnr. Helbest no, 26) di heman demê de li ser navê Melayê Bateyî jî dixuyê. 2 helbest ên Elî Herîrî, helbestek a Mela Ehmedê Cizîrî, 3 helbest ên Melayê Bateyî, helbestek a Mela Meqşûdê Esamî, helbestek a Durefşanî, helbestek a Remezan û 2 helbest ên Muradxan in. Di wan nav mecmû'eyan de menzûmeya Kela Dimdimê (helbest no: 37) tenê di vir de heye. Kela Dimdimê ya Feqiyê Teyran e û di nav kurdan de wek destaneke netewî cihê xwe girtiye. Di 1608an de li Kela Dimdimê, di navbera kurdên ji mîrekiya Biradost û Sefewiyan de şerekî zor diqewime û dawiyê kurd şehîd dikevin. Feqiyê Teyran jî di vê helbesta xwe de behsa vê bûyerê dike. Li gorî krîterên tewsîfa nusxeyan zanyariyên mecmû'eya di Kurd 36an de weha ne:

Navê Berhemê	: Li rûpela pêşîn
Bi Kurdî	: Mecmû'eyê Xezeliyatêd Şu'erayêd Kurmancan e [مجموعا غزلياتيد شعرايد كورمانجانه]
Bi Frensî	: <i>Recueil de poésies Kurdes</i>
Zanyariyên Rûpela Pêşîn	: <i>Ces poésies sont de poètes suivants: Ahmed Khani, Faki-Teiran ait Mouhammed, Ali-Hariri, Baté, Esami, Dourfechani, Mela Ahmed Djizri, Ramazan, Mourat-Khan.</i>
Taybetiyên Bergê	: Berg şîn e û karton e. Hemû kaxezên hundirê bergê ji aliye piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûtin.
Taybetiyên Kaxezê	: Kaxezên vê mecmû'eyê zer in. Bi giştî her du aliyên wereqê hatine bikaranîn. Li her rûpelê du xêzên zirav ji serî heta binî hatiye kişandin ku bi saya van xêzan di navbera her malikê de valahiyekek çê bûye. Destnivîsa mecmû'eyê bi xeta riq'eyê ye.
Hejmara Wereqan	: Bi tevahî 41 wereq in.
Hejmara Sitûnan	: Her rûpel ji du sitûnan pêk tê.
Hejmara Rêzan	: Bi tevahî 630 rêz in û di her rûpelê de 12 rêz hene.
Ebadên Destxetê	: 24x17 cm.
Rengê Murekkebê	: Di vê destxetê de du cure reng hatiye bikaranîn. Helbestên mecmû'eyê bi murekkeba reş e, lêbelê di sernavan de navê helbestvan bi murekkeba şîn hatiye nivîsîn.
Pêşiya Nusxeyê	:

	<p>Xezelê Ehmedê Xanî Îro li textê dilberê ya Reb çî şîrîn esmer e Jê nabitin min dilberê ew dilber e yan dilber e (wr. 2b)</p>
Paşiya Nusxeyê	: Di paşî wan qisan ra ji nebî û ewliyan ra Ji Mîm û Hê û Xan ra Fatihe ji rûhê wan ra (wr. 36b)
Sernav	: Di serê her helbestê de navê helbestvan yan jî naveroka helbestê wek sernav hatiye danîn. Ev sernav jî diyar dike ka ev helbest ya kê ye. Bo nimûne di serê çend helbestan de sernavên weha hene: Xezelê Ehmedê Xanî, Ehmedê Xanî Fermayed, Qewlê Hespê Reş Hikayetê Elî Herîrî Nam, Qewlê Zenbîl Gofteê Bate, Feqî Teyran Muhemmed Nam.
Derkenar	: Di dawîya helbesta 26an (wr. 21a) de ya bi navê “ <i>Qewlê Zenbîl Gofteê Bate, Feqî Teyran Muhemmed Nam</i> ” di rêza ku mexlesa helbestvan derbas dibe [Ey Mîm xweşdefter e] nişeyek bi zimanê tirkî, li raserî peyva “ <i>Mîm</i> ” hatiye danîn ku weha dinivîse: “ <i>Muhammeddîr, Feqiyê Teyran dîrler</i> ” ⁸ . Jaba nişeyek di binê menzûmeya Zenbîlfiroş (wr. 21a) de daniye ku bi fransîzî weha nivîsiye: (a) <i>Le copiste a cesit o abord le nom de Mella Bate, puis il a cesit le nom de Feqi Teiran. il faut se tenir au premia nom</i> ⁹ .
Taybetiyên Din	: Di hemû helbestan de navê helbestvanan bi hibra şîn ve hatine nivîsîn. Herweha di vê mecmû'eyê de wereqên vala ev in: 6a, 7a, 8a, 18, 19, 20, 21b, 36a, 37, 38, 39, 40.
Helbest No, 1:	Em ê yek bi yek helbestên vê mecmû'eyê bidin nasandin: Ev helbest di arşîva Kurd 26an (wr. 2b) de jî cih digire. Xezel Ehmedê Xanî Fermayed
Helbest No, 2:	Îro li textê dilberê ya Reb çî şîrîn esmer e Jê nabitin min dilberê ew dilber e ya dilber e (wr. 2b) Ev helbest di mecmû'eya Kurd 26an (wr. 3b) de jî cih digire. Ehmedê Xanî Fermayed
Helbest No, 3:	Ey dil ger te divêtin bibî daîm mesrûr Di terebxaneê dunya vexwe ava engûr (wr. 3b) Ev helbest di mecmû'eya Kurd 26an (wr. 4a) de jî cih digire. Ehmedê Xanî Fermayed
Helbest No, 4:	Ey dil eger bi neqdê can cinsê giranbuhayê zulf Dê bikirî bizan mecal cewher û canfedayê zulf (wr. 4b) Ev helbest di mecmû'eya Kurd 26an (wr. 4b) de jî heye; Ehmedê Xanî Fermayed
Helbest No, 5:	Ey dil qelb nahejî yek ser mû ji tayê zulf Ger nehejî tu pêlekî şubhetê min li bayê zulf (wr. 4a) Ev helbest di mecmû'eya Kurd 26an (wr. 4b) de jî heye; Ehmedê Xanî Fermayed

8 Wergera vê weha ye: Navê wî Muhemmed e, [lê] jê re dibêjin Feqiyê Teyran.

9 Wergera vê hevokê weha ye: Mustensîx [heye ku qesda Jaba, seydayê wî Mela Mehmûdê Bazidî be] pêşî navê Melayê Bateyî got, paşê wî navê Feqiyê Teyran hişt/nivîsî. Divê hûn li ser navê ewil bisekinin.

- Helbest No, 6:** Me dî neqşek ji neqşê neqşîbandan
Vebû bendê di min yek yek ji zendan (wr. 5b)
Ev helbest di mecmû'eya Kurd 26an (wr. 25b – 26a) de jî heye;
Ehmedê Xanî Fermayed
Durdane ji dev da me dibarin dem û satan
- Helbest No, 7:** Kes nîne bibit wan bigerîne di welatan (wr. 5a)
Ev helbest di mecmû'eya Kurd 26an (wr. 24b – 25a) de jî heye;
Medhinana Ehmedê Xanî Derheqê Hakîmê Bazîdê Muhammed Beg
Kane Muhammed Beg kanê, kan padişahê Serhedan
Îro ji dil bigrîn de lo, kan padişahê Serhedan (wr. 7b)
- Helbest No, 8:** Ehmedê Xanî Fermayed
Ey wahidê pinhan ku ji zatê tene peyda
Ew kevn û mekan, erd û sema, kunbedê xedra (wr. 9a)
- Helbest No, 9:** Ehmedê Xanî Fermayed
Ey ayîneê dil bi cemala te mucella
Wey sed sefhe bi yek zerre ji nûra te mutella (wr. 10b)
- Helbest No, 10:** Ev helbest di mecmû'eya Kurd 27 (wr. 36a)an de jî heye û weha dest pê dike;
Ehmedê Xanî Fermayed
Neqqaşê ezel roja serlewheê rengîn da
Pergar di destan bû sersefhe ku tezyîn da (wr. 10b)
- Helbest No, 11:** Ehmedê Xanî Fermayed
Ji le'lê di yarê emin mey vexwara
Bi dil min dibexşî Bedexşan û Buxara (wr. 11b)
- Helbest No, 12:** Ehmedê Xanî Fermayed
'Işweyek da me seherê periya hurîsîfet
Şefeqa berqê cemalê dil û can sûht û birîşt (wr. 11b)
- Helbest No, 13:** Ehmedê Xanî Fermayed
Mîrê meclîsê nekenit mitribê goya çi bikit
Xuncey xendan nebitin bilbilê şeyda çi bikit (wr. 11a)
- Helbest No, 14:** Ehmedê Xanî Fermayed
Ez çûme derê meykedeê subhekî zû,
Min dî yek esmer
Qamet bi mesel şubhê çînarê û du gesû,
Manendê du ecder (wr. 12b)
- Helbest No, 15:** Ehmedê Xanî Fermayed

- Helbest No, 16:** Seydê çengala serê zulfa şeha şehbaz im ez
Mestê cama 'işweya şehnazê nazik naz im ez (wr. 12a)
Ev helbest a Ehmedê Xanî ye lê bê sernav hatiye nivîsîn. Weha dest pê dike:
Hêdî li îbrişim bide ey mitribê demsaz
Sed dil bo venbeste her yek bi du sed naz (wr. 12a)
- Helbest No, 17:** Ehmedê Xanî Fermayed
Her dinalim şev û rojan meger Eyyûb im ez
Hêstiran her vedimalim meger Ye'qûb im ez (wr. 13b)
- Helbest No, 18:** Ehmedê Xanî Fermayed
Ey dil qelb nahejî yek ser mû ji tayê zulf
Ger nehejî tu pêlekî şubhetê min li bayê zulf (wr. 13b)
Ev helbest beriya vê di Helbest No: 4an de jî derbas bûbû.
- Helbest No, 19:** Ehmedê Xanî Fermayed
Ez çûme baxê sorgulan weqtê sehergahê bi xef
Min dî sedaya bilbilan dagirtibû her çar teref (wr. 13a)
- Helbest No, 20:** Ehmedê Xanî Fermayed
Ji derdê 'eşqê bedhal im 'ecep pir bûye min narek
Were cana bibîn hal im ne min dil ma ne dildarek (wr. 14b)
- Helbest No, 21:** Ehmedê Xanî Fermayed
Zahidê xelwetnişîn pabestê kirdarê xwe ye
Tacirê rihletguzîn derbendê dînarê xwe ye
'Aşiqê dilberhebîn dildayê dildarê xwe ye
Vî zemanî her kesek bê şubhe xemxwarê xwe ye (wr. 14a)
- Helbest No, 22:** Ehmedê Xanî Fermayed
Dilo carek xwe dilxweş ke di ho da çîne seyranê
Bi carek bes xwe bîr meke were seyra gulistanê (wr. 15b)
- Helbest No, 23:** Ev helbest di mecmû'eya Kurd 27an (wr. 22b) de jî heye û weha dest pê dike:
Ehmedê Xanî Fermayed
Ey derîxa mame تنها ez ji şemsa xawerê
Xan û man têk bûne zulmet paşî wê dêm enwerê (wr. 15a)
- Helbest No, 24:** Ehmedê Xanî Fermayed
Dila qet nîne mehbûbek ji te cuz'ek nebit lalî
Dilarama ne meczûbek heye sirra te jê xalî (wr. 16a)
- Helbest No, 25:** Ehmedê Xanî Fermayed

- Helbest No, 26:** Şîweê 'işwe û nazêd ku dildar dikin
'Aşiqan bo çi gelo hinde qedêr har dikin (wr. 17a)
Ev menzûme di sê wereq û pênc rûpelan de hatiye nivîsîn. Dest-
pêk û dawîya vê weha ye:
Qewlê Zenbîl Gofteê Bate, Feqiyê Teyran Muhemmed
Nam
Ey dil werîn dîsa bi coş
Carek ji cama meyfiroş
Bikin qisseta Zenbîlfiroş
Da seh bikin hikayetê (wr. 21a)
...
Ey Mîm xweşdefter e
Heçî ji min ne bawer e
Ne ji ummeta pêxember e
Ne musteheqqê şefa'etê (wr. 23a)
- Helbest No, 27:** Ev menzûme di sê wereq û pênc rûpelan de hatiye nivîsîn. Dest-
pêk û dawîya vê weha ye:
Qewlê Hespê Reş Hikayetê Elî Herîrî Nam
Mecal ew mecal bû, kafiye dîn betal bû, hespek çê li bal bû
Hespê di nêv kuffaran e, bi dil musulman e, Muhammed pê 'el-
lame (wr. 24b)
...
Xaç ji xûn e çêkiriye, 'ewrekê reş î tarî, baranek jî dibarî
Sûnd nik ve li 'Umer û 'Elî, ji şehîd bit deşta, Bedr û Huneynê (wr.
26a)
- Helbest No, 28:** Ev helbest di arşîva Kurd 26an (wr. 9a) de jî heye.
Xezel Bate Fermayed
Derd û dax im derman le'lê yaran hû
Sîne germ im efxanê pêt û narin hû
Dê çilê kim ez milk û mal û zêr
Ji gerdana zer ez hêvîdar im hû (wr. 27b)
- Helbest No, 29:** Ev helbest di arşîva Kurd 26an (wr. 9a) de jî heye.
Xezel Bate Fermayed
'Aşiqê zulfa reş im, 'aşiqê şeyda ye zulf
Bê bade lew serxweş im, serxweşê şeyda ye zulf
Serxweş im ez vê demê, keftime tora xemê
Kuştîme vê perçemê, çiçek û re'na ye zulf (wr. 27b)
- Helbest No, 30:** Ev helbest di arşîva Kurd 26an (wr. 9b) de jî heye.
Xezel Esamî Fermayed
Çira hûn rayekî nakin li min way
Min îro xan û man wêran e îro (wr. 28b)
- Helbest No, 31:** Ev helbest di arşîva Kurd 26an (wr. 18b) de jî heye. Di sernavê
vê helbestê de bi tîpên erebî *Durefşanî* dinivîse lêbelê di berga
yekem a vê mecmû'eyê de bi tîpên latînî-fransîzî *Dourfechani*

- [Durfeşanî] hatiye nivîsîn. Helbest weha dest pê dike:
Xezel Durefşanî Fermayed
Dîsan dixwîne dilberek, min dî ji nûra rehmetê
Ebrû keman leb şekkerek, da min piyalek şerbetê (wr. 28a)
Helbest No, 32: Ev helbest di arşîva Kurd 26an (wr. 18a-18b) de jî heye.
Xezel Elî Herîrî Fermayed
Xelqo werin bibînin çî husnek e bi kemal e
Heyran ji dil bibînin ji sun'ê Zulcelal e (wr. 29b)
- Helbest No, 33:**
Mela Ehmedê Cizîrî Fermayed
Îro li ser belgê gulê zulfan ji 'enber dav veda
Her ro xeyalek tê Melê bayê şimalê kir bela (wr. 30b)
- Helbest No, 34:**
Xezelê Remezhan
Billahî me kes nîne tu yî can û kes î min
Xiyretê rica nîne ji bo min tu bes î min
Her 'îşq û hewayaya te bes e multemis î min
Zinhar çî behtê di dil pir hewes î min
Xûrşîdsî ye bûye ji dûdê nefis î min (wr. 31b)
- Helbest No, 35:**
Xezelê Muradxan
Ey dil te xelet kir ku serê zulf du ta girt
Beyhûde te ew riştedil qeyd çira girt (wr. 32a)
- Helbest No, 36:**
Xezelê Muradxan
Me dişa zehî cebîn mihr û riza mislê melek
Nazika hûrsifet sîmbera leb şekkerek (wr. 33b)
- Helbest No, 37:** Ev menzûme di çar wereq û şeş rûpelan de hatiye nivîsîn. Dest-
pêk û dawîya vê weha ye:
Hikaya Şerê ser Keleya Dimdimê digel Qizilbaşan Goftê
Feqî Teyran
Helal kirye Tahayê, mezhebê qe kêr nayê
Em dimrin nayne rayê, axret xoştire ji dunyayê (wr. 33a)
...
Di paşî wan qisan ra, ji nebî û ewliyan ra
Ji Mîm û Hê û *Xan ra, fatihe ji rûhê wan ra* (wr. 36b)

Li dawîya vê tewsîfa mecmû'eya Kurd 36an de em dikarin hinekî li ser mexlesa şairê kurd yê ku vê taliyê bi xêra van mecmû'eyên koleksiyona Jaba hat zanîn, "Durefşanî" yan jî "Durfeşanî" bisekinin. Herçend xwendina wî navî bi herfên kurdo-arabîk "Durefşanî" be jî li gor wezn û erûzê *Durfeşanî* be eger, dê rihetir li qalibên weznan biguncê. Çunkî ev mexles ji çar kîteyan pêk tê û li gorî tef'îleyên erûzê qet nebe kîteya duyem kîteyêke kurt be hingê bêyî ku zîhaf yan jî îmaleyek çêbibe, dê bikeve qaliba weznê. Jixwe em gava notên A. Jaba jî dinêrin, dibînin ku wî jî terciheke bi vî rengî kiriye û mexlesa şair wekî ku em jî dibêjin "Dourfechani" nivîsiye. Jaba îhtîmaleke mezin ev form ji devê Mela Mehmûdê Bazidî girtiye.

3.6. Tewsîfa Mecmû'eya Kurd 45

Di vê mecmû'eyê de bi tevahî sê helbest hene. Ji wan ya yekem *Ey Av û Ava* Feqiyê Teyran e; ya duyem *Qewlê Newala Sîsebanê* ye û ya sêyem jî *Zenbîlfiroş* e. Menzûmeya *Ey Av û Av* di mecmû'eya Kurd 27an de jî heye. Di navbera herdu nusxeyan de li hin cihan cudahiyên biçûk hebin jî bi giştî wekî hev in. Di wan mecmû'eyan de ya herî zêde hatiye nivîsîn menzûmeya *Zenbîlfiroş* e. Di wan mecmû'eyan de du guhertoyên *Zenbîlfiroşê* hene. *Zenbîlfiroşa* vê mecmueyê wekî yê Kurd 28 û 29an e. Dîsa li gorî naveroka vê mecmû'eyê em dikarin di kategoriya "Mecmû'eya menzûmeyan" de binirxînin. Li gorî krîterên tewsîfa nusxeyan zanyariyên mecmû'eya di Kurd 45an de weha ne:


Navê Berhemê	: Li berga pêşîn hatiye nivîsîn.
Bi Fransizî	: <i>Manuscrit contenant Trors poemes Kurdes</i>
Zanyariyên Rûpela Pêşîn	: 1, Réverie sur les bords de de la ruiere de Mikis 2, Nevala Siseban ou bataille luluirecéé aur Djenevir par Faki – Teiran 3, Zenbil-Ferouch (vendeur de paniers) par Mella Baté Di wereqa 16a'yê de jî zanyariyên helbestên hene, weha dinivîse: <i>Nevala Siseban ou bataille livreé aur Djeneziv (Penois) Dans la valeé de Siseban par Faki Teiran.</i> Di wereqa 46a'yê de jî sernaveke din heye ku weha ye: <i>Zenbil-ferouch (vendeur de paniers) par Mella Bate, voir le résumé de ce poème, en français, à la fin de ce même poème.</i>
Taybetiyên Bergê	: Berga mecmû'eyê tune. Hemû kaxezên hundirê bergê ji aliye piştê ve bi bendê bi hev ve hatine dirûtin.
Taybetiyên Kaxezê	: Kaxezên vê mecmû'eyê zer e û di her rûpelê de 9 rêz hene.
Hejmara Wereqan	: Bi tevahî 59 wereq in.
Hejmara Sitûnan	: Her rûpel ji du sitûnan pêk tê.
Ebadên Destxetê	: 24x17 cm.
Qeyda Temetê	: Di dawiya menzûmeya <i>Qewlê Newala Sîsebanê</i> de qeyda temambûnê weha hatiye danîn: <i>Temmet qisset Siseban fî şîtaî Erzurum.</i>
Dîroka Îstinsaxkirinê	: h. 1282. (m. 1866)
Pêşiya Nusxeyê	: Haza beyti Feqî Teyran bi avê ra xeber daye Beytê dibin pir xoş in guh didin xwedan kemal Ey av û ave hey av û av ma tu bê 'işq û muhbet î Mewc û pêlan davê bêlav bê sekûn û bê rahet î (wr. 1a)
Paşiya Nusxeyê	: Her çî pê ji min bawer netê ne musteheqqê şefa'etê Mexrec dûr e roja axretê ya Muhemmed herçî pê ji ne bawer e Bizan ne ummeta pêxember e ew bê hêvî ye ji şefa'etê Temmet (wr. 58b)
Sernav	: Di vê mecmû'eyê de sernavên hersê helbestan hatiye danîn.

- Sernav bi erebî dest pê dîkin lê bi kurdî dewam dîkin. Bo nimûne, di helbesta ewil de sernav weha ye: *Haza Beyti Feqiyê Teyran bi avê ra xeber daye.*
- Derkenar** : Gelek nîşeyên bi fransîzî-latînî li ser deqê hatine girtin. Carnan bi wan notan wergera peyvê yan jî hevokê kirine carnan jî wek jêrenot hin tişt derbarê helbestê de hatiye nivîsîn.
- Taybetiyên Din** : Bi tenê di rûpela yekem de hejmar ji bo sahîfeyê hatiye danîn ku ew jî 7 e, ji bilî vê tu hejmar tune ye. Herweha xêncî wereqa ewil, di wereqên din de tenê milê rastê hatiye nivîsîn û milê çepê vala hîştine.
- Helbestên vê mecmueyê weha ne:
- Helbest No, 1:** Ev helbest a Feqî Teyran e. Di arşiva Kurd 27an (wr. 23a-26b) de jî Ey av û av a Feqî heye. Wereqa ku dawîya helbestê tê de cih digire nîvco ye, bi awayekî kaxez çiriyaye yan jî jê ketiye. Ji ber vê ev helbest di vê mecmû'eyê de tam nîne. Helbest weha dest pê dîke;
- Haza Beyti Feqiyê Teyran bi avê ra xeber daye.
Beytê di min pir xweş in guh diden xwedan kemal
Ey av û ave hey av û av ma tu bê 'îşq û muhbet î
Mewc û pêlan dawî bilav bê sekûn û bê rahat î (wr. 1a.)
...
Hetta xoş in kul man birîn diket maye çerx û 'adetê
Felek tu bê wefa yî te çira mihnet nedayê (wr. 15b)
- Helbest No, 2:**
- Haza beyti Siseban bi Ciniwizan ceng kiriye
We bihi neste'înu ya Ellah ya Mu'în
Subhanellahi el-ehedi kulle şeyîn qedîr
Qedîmun we Rebbu`s-semedu
Hem axîr û lem yelîd we lem yuled
...
'Eresatê wechê hebîb bibînim
Ji bîr mekin hûn wê weqtê her dem
Her sa'eta ne hîmmet
Ewan di bîra xwe werînin (wr. 46b)
- Helbest No, 3:**
- Haza qewli Zenbîlfiroş 'Aşiqê Zelîl
Ey dil werî ey hûn werî dîsan bi coş
Camek ji cama meyfiroş
Bikim qisseta zenbîlfiroş
Da seh bikin hikayetê (wr. 47b)
...
Herçî ji min bawer netê
Ne musteheqê şefa'etê

Mexrec dûr e roja axretê
 Ya Muhammed herçî jê ne bawer e
 Bizan ne 'ummeta pêxember e
 Ew bê hêvî ye ji şefe'etê (wr. 58b)

4. TÊKILIYA MECMU'EVAN

Me di vê lêkolînê de li gor krîterên dîsîplîna destnivîsan ew mecmû'e analîz kirin. Di vê koleksiyonê de mecmû'eya herî kevn Kurd 26 e ku bi qasî sêsed salî dixuyê ku belkî di serê sedsala 18an de hatibe nivîsîn. Rûpel û wereqên vê mecmû'eyê belav bûne û ji hev derketine, lê piştî cardin restore kirine û anîne cem hev. Li gorî tesbîtên me mecmû'eya Kurd 36, kopîkirin û jinûve nivîsîna mecmû'eya Kurd 26ê ye ku di vê mecmû'eyê de jî qeyda îstînsaxê tune ye û destnivîs jî ya Mela Mehmûdê Bazidî ye. Qeyda îstînsaxê yê mecmû'eyên Kurd 27, Kurd 28, Kurd 29, Kurd 45 bi rêzê 1855, 1859, 1860 û 1866 hatine tesbîtîkirin. Em dikarin şecere û têtikiliya van mecmû'eyan bi şemayê weha jî diyar bikin:



5. ENCAM

Mecmû'e berhemên edebî yê berhevkerî ne. Berhemên bi vî rengî dikarin derbarê zewqa edebî ya xwediye xwe yan jî di serdema ku hatiye nivîsîn de agahiyên girîng bidin. Di vê çarçoveyê de, mecmû'e di biwara edebiyata klasîk û dîroka edebiyatê de xwedî cihekî girîng in. Ji mecmû'eyên helbestan re di edebiyata kurdî ya klasîk de "keşkûl" jî tê gotin ku ew di serdema modern de beramberî "antolojiyan" têt. Em di vê gotarê de li ser mecmû'eyên helbestan rawestîyan ku li koleksiyona Aleksandre Jaba, di bin klasorên Kurd 26, Kurd 27, Kurd 28, Kurd 29, Kurd 36 û Kurd 45an de hatine tomarkirin û bi tevahî şeş mecmû'e ne. Mecmû'eya herî kevn a vê ko-

leksiyonê Kurd 26 e ku bi qasî sêsed salî dixuyê. Herweha qeyda îstînsaxê ya mecmû'eyên Kurd 27, Kurd 28, Kurd 29, Kurd 45 bi rêzê 1855, 1859, 1860 û 1866 hatine tesbîtkirin. Gava ku em têkilî û şecereya di navbera van mecmû'eyan dinêrin dibînin ku Kurd 36 li ber Kurd 26an hatiye îstînsaxkirin, yê din jî mecmû'eyên serbixwe ne.

Di vê koleksiyonê de mecmû'eyên Kurd 28, Kurd 29 û Kurd 45 ji aliyê naveroka xwe ve tenê ji çend menzûmeyan pêk hatine. Lewma em dikarin wan mecmû'eyan di bin sernavê "Mecmû'eya menzûmeyan" de bisenifnin.

Di her şeş mecmû'eyan de helbestên şairên kurd ên wekî Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Muradxanê Bazîdî, Esamî, Durfeşanî, Xiyasî, Xewsî hatin tesbîtkirin. Bi xêra van mecmû'eyan di edebiyata kurdî ya klasîk de cara ewil şairên wek Esamî, Durfeşanî, Xiyasî û Xewsî hatin bihîstin. Herweha gelek varyant û destnivîsên nû yê destan û menzûmeyên wek *Zenbîlfiroş*, *Qewlê Newala Sîsebanê*, *Borê Qer (Hespê Reş)* û *Ey Av û Av* bi van mecmû'eyan re çêbûn.

Ji bilî helbestên kurdî tenê di mecmû'eya 26an de, anku di mecmû'eya herî kevn de, hin helbestên bi farisî û tirkîya osmanî jî di van mecmû'eyan de hatin tesbîtkirin. Di van zimanan de şairên wek Şemsê Tebrîzî, Şêx Se'dî, Nabî, Durrî, Dîwanî, Eswed, 'Abid û Xosro cih girtine. Ji van şair û helbestên farisî û tirkîya osmanî ku di vê mecmû'eyê de cih digirin, mirov dikare şîroveyek bi vî rengî bike ku di sedsala 18an de li hin mîrektî û bajarên kurdan di nav alim û şairên kurdan de helbestên farisî û tirkî dihatin xwendin. Lewma li gor rêjeya helbestên bi farisî û tirkî, em dikarin bibêjin ku herçend kême be jî têkiliyek di navbera edebiyata kurdî û edebiyata farisî û edebiyata tirkî de hebû. Herweha di mecmû'eyên din de helbestên erebî, farisî yan jî tirkî cih nagirin, tenê helbestên kurdî hatine tomarkirin. Bi raya me sedema vê yekê daxwaza A. Jaba ye.

Gava ku em bi giştî li van her şeş mecmû'eyan dinêrin, hingê dibînin ku di nav şairan de herî zêde navê Ehmedê Xanî derbas dibe. Ev jî nîşan dide ku li dor mîrekîtiya Bazîdê (heta mîrekîtiyên Miks, Hîzan û Hekkarî jî tê de) Ehmedê Xanî ne tenê bi berhemên xwe yê dînî yê ku di medreseyan de têne xwendin, herweha bi kesayeta xwe ya edebî jî bandoreke mezin kiriye. Piştî Ehmedê Xanî, em rastî navê Feqiyê Teyran tînin ku di van mecmû'eyan de bêtir menzûmeyên wî yê dirêj cih girtine wekî *Ey Av û Av*, *Zenbîlfiroş* û *Kela Dimdimê*. Ji bilî xezel û qesîdeyên kurdî, menzûmeyên wek *Zenbîlfiroş* şeş caran, *Qewlê Newala Sîsebanê* çar caran, *Qewlê Hespê Reş* du caran, *Kela Dimdimê* du caran û *Ey Av û Av* du caran hatine nivîsîn. Herweha di van mecmû'eyan de hebûna van her pênc menzûmeyan nîşaneyê belavbûn û navdarbûna wan menzûmeyan jî raberî me dike. Helbet ev belavbûn û navdarbûn li gorî van şeş mecmû'eyên helbestan, tenê wê herêma ku dikeve nav mîrekîtiya Bazîd, Miks, Hîzan û Hekkariyê di xwe de dihevine. Çunkî ew keresteyên kurdî li ser daxwaza A. Jaba, ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdî û melayên wan deran ve hatine berhevkirin.

ÇAVKANÎ

Adak, A. (2017). "Destnivîsên Mewlûda Melayê Bateyî di Arşîva A. Jaba de: Nasandin û Analîz". *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 2/2, Havîn, r. 1-29.

Bazîdî, Mela M. (2020). *Kêşana Karên Kurdî*. (Mîkaîl Bilbil û Mustafa Öztürk, Amd.), Stenbol: Weqfa Mezopotamyayê.

Bazîdî, Mela M. (2010). *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*. (Zîya Avci, Amd.), Stenbol: Lîs.

Celîl, C. (2004). *Keşkûla Kurmancî Sedsaliyên X û XX*. Wîen: Ayhan.

Çelik, M. (2015). "Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bazîdî". Teza Lîsansa Bilind, Enstituya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardin Artuklu, Mêrdîn.

Demir, A. (2012). *Qewlê Newala Sîsebanê*. Stenbol: Nûbihar.

Develioğlu, F. (2001). *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lugat*. Ankara: Aydın.

Doskî, T. Î. (2020), *Baxê Îrem*. (M. Zahir Ertekin, Amd.), Stenbol: Dara.

Hartmann, M. (2015). "Li ser Edebiyata Kurdî & Li ser Melayê Cizîrî". *Nûbihar Akademî*, (Abdullah İncekan, Wer.), jimar 3, sal 2, r. 119-133.

Hartmann, M. (1904). *Der Kurdische Diwan des Schech Ahmed von Geziret Ibn 'Omar genannt Mala'î Gizri*. Berlin: S. Calvary.

Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*. (Wer.) İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, İstanbul: Avesta.

Hezîn, Mela H. (2007). *Kolxaniya Veşartî*. Stenbol: Nûbihar.

Jaba, A. (1860). *Recueil de Notices et de Récits Kourdes*. St. Petersburg: weş. nîne.

Köksal, M. F. (2012). "Şiir Mecmû'alarının Önemi ve "Mecmû'aların Sistematik Tasnifi Projesi" (MESTAP)". *Eski Türk Edebiyatı Çalışmaları VII, Mecmû'a: Osmanlı Edebiyatı Kırkambarı*, (Hatice Aynur û yd., Amd.), r. 411-433.

Kurij, S. (2017). *Metnî Verên yê Kirdkî, Xebatê Kurdolojî yê Peter Lerchî*. Diyarbekir: Lîs.

Kurnaz, C. û Aydemir, Y. (2013). "Mecmualara Sorulması Gereken Sorular". *Turkish Studies*, c. 8/1, Zivistan, Ankara.

Le Coq, A. v. (1903). *Kurdische Texte*. Berlin: Reichsdruckerei.

Leezenberg, M. (2011). "Soviet Kurdology and Kurdish Orientalism". *The Heritage of Soviet Oriental Studies*. (Michael Kemper û Stephan Conermann, Ed.), New York: Routledge, r. 86-102.

Mardoukhi A. M. (1998). *Anthology of Gorani Kurdish Poetry*. (Anwar Soltani, Ed.), London: Soana Trust for Kurdistan.

Руденко, М.Б. (1961). *Описание Курдских Рукописей Ленинградских Собраний*, Академия наук СССР Институт Народов Азии, Москва: Издательство Восточной Литературы. [Rudenko, M. B. (1961). *Danasîna Destnivîsên Kurdî yên Berhevokên Lêningradê*, Akademiya Zanistî ya YKS-Sê (Yekîtiya Komarên Sosyalîst yên Sovyetê) ya Gelên Asyayî, Moskova: Weşanxaneyê Edebiyata Rojhilat.]

Qeredaxî, M. E. (1998). *Bûjandinewey Mêjûy Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetkanyanewe*. c. I, Bexda: Çapxaney Wemîd.

Rohat. (1991). *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, İstanbul: Deng.

Subaşı, K. (2020). "Destnivîsên Mecmû'eyên Kurd (21-22-47) ên di Koleksiyona Aleksandre Jaba (Nûbar û Eqîdeya Îmanê)". *Kurdiyât*, jimar 1, r. 23-44.

Tarlan, A. N. (1946). "Eski Mecmualar Arasında". *İÜ Edebiyat Fakültesi TDE Dergisi*, c. 1, jimar 1-2-3-4, r. 122-137.

- Teyran, Fâki-yi. (2014). *Divan=Dîwan*. (Kadri Yıldırım, Çev.), Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı.
- Teyran, F. (2012). *Jiyan Berhem û Helbestên Wî*. (M. Xalid Sadî, Amd.), ç. 6, Stenbol: Nûbihar.
- Ulugana, S. (2016). "Di Kurdolojiyê de Keşfeke Nû: Xewsî û Dîwana Wî (Sedsala XVIII.)", *Nûbihar*, j. 137, Payîz, r. 5-9.
- Uzun, M. (2003). "Mecmua", *DîA*, (c. 28, r. 265-268), Ankara: TDV.
- Xanî, E. (2014). *Dîwan*. (Kadri Yıldırım, Amd.), İstanbul: Avesta.
- Yûsuf, A. (1988). *Şaîrên Klasîk ên Kurd*. Uppsala: Jîna Nû.
- Yıldız, A. (2021). *Qewlê Hespê Reş (Lêkolîn û Metn)*, Wan: Peywend.

Çavkaniyên Destnivîs

- Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor no: Kurd 26.
- Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor no: Kurd 27.
- Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor no: Kurd 28.
- Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor no: Kurd 29.
- Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor no: Kurd 36.
- Koleksiyona Aleksandre Jaba, Klasor no: Kurd 45.

PÊVEK-1 / TABLOYA ŞAIRAN Û HELBESTAN DI VAN MECMÛ'EVAN DE


Navê Şair	Navê Klasorên Mecmû'eyên Helbestan di Arşîva A. Jaba de					
	Kurd 26	Kurd 27	Kurd 28	Kurd 29	Kurd 36	Kurd 45
'Eliyê Herîrî	1 1 (QHR) ¹⁰	-	-	-	1 1 (QHR)	-
Melayê Cizîrî	-	-	-	-	1	-
Feqiyê Teyran	1 (Z) 1 (KD)	3 1 (Z) 1 (EAA)	-	1 (Z)	1 (KD) 1 (Z)	1 (EAA) 1 (Z)
Ehmedê Xanî	8 + 1 ¹¹	2	-	1 (QNS)	25	-
Melayê Bateyî	3	1	1 (Z)	-	2	-
Muradxanê Bazîdî	-	-	-	-	2	-
Xiyasî	1					
Mela Meqsûdê (Esamî)	1	-	-	-	1	-
Durfeşanî	1	-	-	-	1	-
Xewsî	1	-	-	-		-
Remezhan	-	-	-	-	1	-
Ehmedê Hekkarî	-	1 (QNS)	-	-	-	-
Nediyar (Bê şair)	1	-	1 (QNS)	-	-	1 (QNS)
H.z. 'Elî	Çend îbare û gotinên wecîz	-	-	-	-	-
Durrî	1	-	-	-	-	-
Dîwanî	1	-	-	-	-	-
Şemsê Tebrîzî	3	-	-	-	-	-
Eswed	1	-	-	-	-	-
'Abid	1	-	-	-	-	-
Nabî	2	-	-	-	-	-
Xosro	1	-	-	-	-	-
Şêx Se'dî	1	-	-	-	-	-

10 Çend kurtepeyvên vê tabloyê weha ne: Zenbîlfiros (Z); Qewlê Newala Sîsebanê (QNS); Qewlê Hespê Reş (QHR); Kela Dimdimê (KD) û Ey av û av (EAA). Ji ber ku ev qesîde gelek dirêj in û bi tena serê xwe wek menzûme û berhemeke serbixwe têne hesabkirin, lewma me xwest ku cihê wan menzûmeyan ji bo diyar be û ji bo xebatên paşerojê ji bo lêkolera hinekî hêsantir bike.



11 Ev şî'r di mecmû'eyê de bêsernav e lê di kitêbên ku li ser Ehmedê Xanî de hatine nivîsîn wek ya wî dixuyê. Lewma me ev şî'r jî li ser Xanî hesab kir ku weha dest pê dîke:

*Ya reb qeddê zîba ye ev yan Ke'beya 'ulya ye ev
Yan Mescîdu'l-Eqsa ye ev yan Sidre yan mermer e ev (wr. 2a)*


PÊVEK-2 / HIN NIMÛNE JI NUSXEYÊN VAN MECMÛ'EVAN




Nimûne 1: Wereqa ewil û ya dawiyê ji Nusxeya Kurd-26an.



Nimûne 2: Wereqa ewil û ya dawiyê ji Nusxeya Kurd-27an.



Nimûne 3: Wereqa ewil û ya dawiyê ji Nusxeya Kurd-28an.





Nimûne 4: Rûpela ewil û ya dawiyê ji Nusxeya Kurd-29an.

نخستین	
ایرود لختی دلیر؛ لب چه شیرین است	تک‌آبانه ست دلیری او دلیر یار دلیر
دل کوی جانانده ای دین پرورم اینکده اش	هر چه صدقه اش هم دو هم کردن نرد
کافر زبیرا بریزد طلا و کبر پر ترانه در	عسکری نیبا ترسناک یانه سرور
زلفش کعبه پرینج ورم یا سینه باغی ام	زنجیره ایستایم شمع یانه آذر
دوب جبارک نامق عودن تنق داکوت شفق	بابک ترک یادق باخته یانه چینه
اودنه با کسوت او ز کینه یانه هنرینه اش	شترینه یا شیره او با نوح شاه شیره
ایرودنه یا جگر هلال هنرینه یا شیناد و خال	کسوتنه یا حنفت یال مشتول الله اکبر
چاقن کعبه سرفشش یا کافرن یاول رشادت	بیامه او یانه خوشی یا نکس و یانه عباد
رخسار یارب یاقرقه قفاق یارب یا کمر	اودنه یارب یا غیر او شکر یانه شکر
اورودنه یانه کعبه آل آلانه یانه دما بخال	قدیق نوزاد لیلاد مائله یانه مظهر
وهر شیشه نرمانق داقق دقه نیبا شیرین علاف	رفق صوره نکس نه فلال شکره شیناد

دوب کتیب حسن یار حاجتید یانه حقی عباد
 این تقدیر عامی چاکه در مان تصدیح اولیره
 لیقنا کعبه نوح جان اودنه یا نوح
 دعب حلی ریما نیبه سیرت قزلبه
 خان کعبه نغمین او عارضین یانه صوره کعب
 اودنه یا شیناد شمال سنجیبا آقا
 دعب قزلبه یا نیبا یانه یانه عیب عیب یانه
 دعب دودمان یانه عالی قزلبه یانه
 اودقایی دل داده به مشتیب ترکی یانه
 دردی وی بارک صاببه لوه زینت دیک نه

سینه یه چون ژنیرا	ای رنگه کوفته کبیرا	خان دانی نهقی ویرا بهشت و صوره شیرا
صورتی ژن مانا	کافران کور مانا	ایریشی یانه دانا بیهن کوشی و جانا
تنگس کازورق	ایریشی آبی برق	استیاد یانه رفق بودمان ز کور شکر
کسوت کسوت یانه	کی خان آکر تینه	کعبه مانا دعبیند کعبه ژین هدیتنه
کعبه ژین داقق	صوبان ویر دگنه	آکر نورده دگنه کعبه مانا دعبین
هر کوشان جیران	شینه یه چون اعدان	بهشت برین زنده مان کعبه دما زلمت
دان می بریسی بن	مقیم نکس بی بن	دعبت یانه بن سرد صوره قصبه بن
	دچلی دان دصا نرا	زنجی و اولیا نرا
	زبیر و هو خالنا	فالخ زور و اولیا

Nimûne 5: Wereqa ewil û ya dawiyê ji Nusxeya Kurd-36an.



Nimûne 6: Wereqa ewil û ya dawiyê ji Nusxeya Kurd-45an.